Welatê Me

ROJNAMEYA HEFTEYÎ | SAL: 1 HEJMAR: 17 | 12 ADAR 1995 | BUHA:25.000 TL(KDVD)

Helebce: Birînêkî qûl û zamêkî beswê

Le yad û salrojî Helebce da mirov nazanêt tif le nawçewanî kê bikat. Be rastîş mirov doşdademênê û nazanêt kê şeytan asa berde baran bikat. Tawanbaran zorin, yek, duwan, de û sed nîn, be tenya Sedamî mirovkuj tawanbar niye, nexêr... Le pişt abakey Sedam ewe zor kesî tirîş tawanbarin, Pir kesên tirîş yarîdeder û zemîne xoşkerin bo ewey Sedam be keyfî xoy Helebce bikate taqîge û piyawanîşî teratên û bazbazênî tiya biken.

Rûpel 16

Homeros û çîrokên kurdî

Du heb pirtûkên hozan Homeros* bi tirkî hatine weşandin: "Ilyada" û "Odysseia". Herdu jî destanên xwerû ne. Di destana "Odysseia" de efsaneyekê bala min kişand. Min ev çîrok di biçûktiya xwe de bihîstîbû.
Di pirtûka "Odysseia" de di beşa nehan de qehreman Odyseeus serpêhatiya xwe ya li qirangê Trakya yê tîne ziman. Li wê qirangê şikefteke dêwê yek çav heye.

Rûpel 7

Yekîtiya ziman pêwist e

Yekîtiya zimên li her welatekî bi awayekî cihêreng pêk hatiye. Du awayên pêkanîna yekîtiya zimên hene. Heta sedsala 20'an yekîtiya zimanan ne bi awayên zanistî, lê bi awayên serdestbûnê pêk hatiye. Ji hêla ramyarî û artêşî ve kîjan êl bi hêztir bûye zaravayê wê bûye zimanê fermî û hemû mirovên din mecbûr mane ku wî zaravayî hîn bibin.

Rûpel 11

KÎ NEWROZA KÊ JI KÊ DISTÎNE?

● Dewleta Tirk û dewletên Tirkî li Newroza gelên bindest xwedî derdikevin. Dibêjin: "Newroz a tirkan e û ew ê herdem tirk bimîne." Qerar ji aliyê generalên tirk ve hatiye standin û wisa ye: "Îro Newroz gelek zerarê dide dewleta me. Divê em çareyekê jê re bibînin û wê dejenere bikin. Ji niha pê ve emê bêjin ku Newroz cejna biharê ye û bi eslê xwe tirk e. Ji bo yekparetiya welatê me lazim e em wê bikin roja tatîla resmî." Tansu Çillerê û hin wezîrên din jî ev qerar îlan kirin. Di pey re komarên Tirkî yên Sovyeta Berê jî gotin rast e, Newroz ya tirkan e.

● Newroz dîroka hezar salan e, bi talîmatên generalan nabe malê dewleteke nijadperest. Kî cejna kê ji kê distîne? Tirkên ku berî 9 sed salan hatin Enedolê çawa bûn xwediyê Newroza 3 hezar salî? Newroz cejna wan kesan e ku bi pêşengiya Kawayê hesinker serê Dehaqê zalim perçiqandin û gihîştin azadiya xwe. Newroz ya wan gelan e ku piştî Dehaq dagirkerên nû azadiya wan ji destê wan standin. Newroz ya wan gelan e ku îro jî, ji bo azadiyê bi pêşengiya Kawayên hemdem li dijî Dehaqên kedxwar mucadeleyê dikin.

Rûpel 2

Li gorî rewşenbîrê kurd Hüseyin Kartal, Ewrûpa di bin tesîra têkoşîna gelê kurd de dimîne:

'Dîwarên betonê têra mirovahiyê nakin'

● Vê gavê meseleya rewşenbîrî teng tê fêmkirin. Mesele ne hilgirtina kaxez û pênûsê ye. Rewşenbîr girîng e riyeke nû veke û ew li pêşiya civakê bimeşe. Lê li nava kurdan piranî gel li pêş rewşenbîran meşiyaye. Yanî di vî warî de rewşenbîrî bi serê xwe jirêzêbûnek e.

Rûpel 8–9

Li Selanîkê şeva bîranîna Teofilos

● Ji bo bîranîna dostê gelê kurd Teofilos Yorgiyadisê ku roja 21'ê adara 1994'an ji aliyê kontrgerîlayan ve hatibû kuştin li Selanîkê şevek li dar ket. Ev şev bi hevkariya Komîteya Kurdistanê, Qibrisê û Pondusan roja 7'ê adarê hatibû amadekirin. Nêzî 500 kesî bi coşeke mezin Teofilos bi bîr anîn. Kesên ku axivîn polîtîkaya komara tirk a li dijî gelê kurd protesto kirin û ji bo azadiya gelê kurd piştgiriya xwe nîşan dan.

www.arsivakurdi.org

DEWLET DIXWAZE NAVEROKA CEJNA NEWROZÊ JI BO ARMANCA XWE YA DAGIRKER BILEWITÎNE

KÎ NEWROZA KÊ JI KÊ DISTÎNE?

21'ê Adara 95'an nêzîk dibe. Ev roja ku ji bo gelên bindest azadî û têkoşîna li dijî zilmê îfade dike. Her sal ji aliyê gelê kurd ve jî bi awayên cur bi cur tê pîrozkirin. Nexasim di Newrozên salên dawî de gelê kurd bi serhildanên pir mezin bala hemû dinyayê kişande ser hesreta xwe ya ji bo azadî û serxwebûnê. Li hemberî bilindbûna serhildanên cejna Newrozê, dewleta tirk niha li pey lîstikên nû digere û dixwaze naveroka Newrozê biguherîne û wê mîna cejna tirkan a biharê bi herkesî bide qebûlkirin.

Bi nêzîkbûna Newrozê re rayedarên Cumhuriyeta Tirkiyeyê, ketin pey lîstikan da ku reng û naveroka vê cejna pîroz biguherînin. Beyanatên ku ji devê serokwezîr û generalên tirk bi awayekî resmî derdikevin, dibin mijara pêkenokan. Li aliyê din gelê kurd ê ku di vê cejna pîroz de heta niha ji bo azadiyê bi hezaran şehîd dane, van daxuyaniyên dewletê protesto dike.

Bi taybetî jî di heftiyên dawî de hemû teorisyen, dîrokzan û siyasetvanên tirk ên nijadperest li ser cejna Newrozê zêde serê xwe diêşînin. Serokwezîra Komara Tirkiyeyê Tansu Çillerê li ser şîret û talîmatên generalan îlan kir ku cejna Newrozê wê bibe rojeke neteweyî ya tirkan, ji ber vê yekê jî, ji niha ve gerek e dest bi haziriyên pîrozkirinê bête kirin. Ev gotina Çiller encama civîna generalên tirk bû. Weke tê zanîn heftiya çûyî, Lijneya Leşkerî ya Neteweyî ku ji generalên tirk, Serokkomar Süleyman Demirel û çend wezîrên din pêk tê, roja duşemê civînek li dar xist û di wê civînê de qerar hate standin ku Newroz cejna tirkan e û gerek e mîna cejna biharê bête binavkirin û bi awayekî fermî di bin kontrola leşkeran de bête pîrozkirin.

Îro li Rojhilata Navîn tu gel bi qasî gelê kurd li Newrozê xwedî dernakeve û ji bo azadiya hemû gelên bindest her sal di 21'ê Adarê de bi sedan kurd canê xwe feda dikin. Mazlum ew agir pêxist û Zekiye Alkan agir bi canê xwe xist.

Piştî vê civînê û bi devê Tansu Çiller îlankirina encama civînê, pêşî wezîrê ji mafên mirovan berpirsiyar, Azimet Köylüoğlu û hin giregirên din ên nijadperest dest bi haziriyan kirin. Azimet Köylüoğlu, ku heta îro ji zerarê pêştir tiştekî din nedayê mafên mirovan, li pey digere ku şeklekî meşrûiyetê bide formula ku generalên tirk ji bo Newrozê fikirîne. Köylüoğlu di beyanata xwe ya dawî de li ser Newrozê wiha dibêje: "Emê vê cejnê bikin roja tatîla resmî û ji bo yekîtiya xwe ya neteweyî pîroz bikin. Ev cejn bereket û qenciyê îfade dike. Li gorî baweriya olî (dînî), şeva Newrozê duayên ku ji yezdan re têne kirin, qebûl dibin. Ev cejn li Azerbaycanê jî

mîna cejna neteweyî tê pîrozkirin. Alewiyên Enedolê jî girîngiyeke mezin didinê vê rojê û divê em ji bo yekparetiya welatê xwe wê bikin roja tatîlê ya resmî." Yanî li gorî talîmatên ku dane Köylüoğlu (Kurêgundiyan) newroz ya kê be jî heçî neya kurdan e.

Piştî van beyanatên rayedar û wezîrên dewleta tirk, Komarên Tirkî jî bi beyanatên nû Newroz kirin malê xwe. Wezîrên Çandê yên Komarên Tirkî (Kırgızistan, Azerbaycan, Özbekistan û Kıbrısa Bakur) roja 18–20'ê adarê wê li Enqereyê werin ba hev û bi civînekê wê îlan bikin ku Newroz cejna hevpar a tirkan e. Li gorî van wezîran Newroz tirk û wê tirk bimîne.

Ev beyanat giş niha di nava kesên ku haya wan ji dîroka cejna Newrozê heye de, dibin mijara pêkenokan. Li ser vê mijarê me dîtina gelek rewşenbîrên kurd û tirk pirsîn, bi giştî pêşî dikeniyan, dû re wiha digotin: "Heta niha van rayedarên dewletê kîjan rastî qebûl kirine ku vê jî wisa bi hêsanî qebûl bikin? Ma ne ew bûn ku ji cejna navneteweyî ya karkeran 1'ê Gulanê re jî digotin, cejna biharê? Dema nikarin rê li ber tiştekî bigirin, li pey digerin ku naveroka wî biguherînin û ji bo berjewendiyên xwe bi kar bînin." Li ser pirsa me meleyekî kurd ku nexwest navê xwe bide wiha got: "Vê dewleta mejîdagirker û kedxwar tevî partiyên xwe yên rastgir û çepgir misilmanî xera kirin, sosyalîzm xera kirin, zanist dejenere kirin, çi tiştê ku rengê mirovahiyê tê de hebe kirasê xwe yên dijmirovî lê kirin û ji bo menfeetên xwe yên faşîst bi kar anîn. Niha jî dor hatiye Newrozê, lê ne mumkun e ew naveroka Newrozê biguherînin gelê kurd şiyar bûye, rê nade wan."

Navenda Nûçeyan

Hilbijartina mebûsan dest pê kir

Ji bo Parlementoya Kurdistanê ya li Surgunê (PKS) hemû sazî, rêxistin û yekîtî hilbijartinên xwe diqedinîn. Roja 4'ê adarê TAJK û YCK'ê mebûsên xwe hilbijartin.

Li Dortmundê, li Navenda Çanda Ehmedê Xanî 44 delegeyên YCK'ê ji bo hilbijartina mebûsên xwe civiyan. Di hilbijartinê de 11 kes bûn berendam. Di dawiya hilbijartinê de 2 endamên YCK'ê ji bo mebûsiyê hatin hilbijartin.

Li Frankfurtê, 46 delegeyên TAJK'ê ji bo hilbijartina mebûsên xwe civînek li dar xistin. Di hilbijartinê de 7 endamê TAJK'ê ji bo mebûsiyê bûn berendam. Di dawiya hilbijartinê de 5 endamê TAJK'ê ji bo mebûsiya PKS'ê hatin hilbijîrin. Bi van hilbijartinan nûnerên ciwanan û jinên kurd yê li surgunê kefş bûn.

Li Mûnîhê, ERNK, TAJK, û YCK'ê ji bo Parlamentoya Kurdistanê delegeyên xwe hilbijartin.

Hefteya çûyî roja şemiyê li Mûnîhê ji bo 2 delegeyên ERNK'ê nêzîkî 200 mirovên Kurdistanî rey avêtin. Roja yekşemê jî ji bo delegeyên TAJK û YCK'ê hilbijartin hate çêkirin. Di hilbijartina TAJK'ê nêzîkî 80 kesî û ji bo YCK'ê jî nêzîkî 75 kesî tevî hilbijartinê bûn.

Yekîtiya Êzîdiyên Kurdistanê delegeyê xwe hilbijartin

Yekîtiya Welatparêzên Êzîdiyê Kurdistanê roja 7'ê adarê, li bajarê Weselê ji bo PKS'ê bi coşî hilbijartina xwe çêkir. Li bajarê Weselê, li salona daweta Serhedê, nêzîkî 1000 Kurdistanî beşdarî şeva hilbijartinê bûn. 600 mirovên Kurdistanî di hilbijartinê de reyên xwe avêtin, 5 rey betal bûn. Di hilbijartinê de 3 kes hatin hilbijartin.

Kurd–A/ Welatê Me

Bûyera Zaxoyê karê dijmin e

Hejmara kesên ku ji ber bombeya ku roja 27'ê reşemiyê li Zaxoyê teqiya emirin, gihîşt 76 kesî. Rewşa 120 kesên ku di vê bûyerê de birîndar bûbûn ber bi başiyê diçe. PKK'ê jî li ser vê bûyerê belavokek belav kiriye û daye zanîn ku ewê tola kesên ku di vê bûyerê de can dane bistîne. Di belavokê de, tê gotin ku ev kirin bi hevkariya metingehkarên tirk û Iraqî çêbûye. PKK'ê, ev belavoka bi zaravayê soranî ku ji 2 rûpelan pêk hatibû roja 5'ê adarê li seranserê başûr Kurdistanê belav kir. Belavok, balê dikişîne ser amadekariyên hêzên tirk û Sedam yên ji bo şer. Ji YNK û PDK tê xwestin ku şerê birakujiyê rawestînin, li hemberî lîstikên kolonyalîstan hemû hêzên welatparêz tev kar bikin. Di dawiya belavokê de soz tê dayîn ku PKK'ê wê heyfa qetlîamê hilîne. Rojekê piştî vê belavokê hinek rêxistinên Başûrî jî belavokek belav kirin û nalet li kesên ji vê bûyerê berpirsiyar, barandin.

Heştê nûnerên 15 hezar penaberên ji bakurê Kurdistanê jî çûn serdana kesên birîndar û li nexweşxaneya Duhokê nûnerên penaberan xwîn dan kesên birîndar. Waliyê Duhokê Abdulmedît Pîk pesna tewra nûnerên penaran da. Piştre ew kes çûn Zaxoyê serdana maliyên kesên ku di bûyerê de can dane.

Li aliyê din hêzên Sedam ji şeva 6'ê adarê bi vir ve derên li nêzîkî sînorê di navbera Iraqê û herêma başûr de di topên giran dikutin. Li ser êrîşên hêzên Iraqê YNK'ê û PDK'ê şer di nav xwe de sekinandin. Hêzên Başûrî li dijî hêzên Sedam hinek êrîş pêk anîn û di wan êrîşan de bi ser ketin. Peşmergeyan şeva 6'ê mehê avêtin ser qereqola Horayê li ser Kerkukê û tevî gelek cebilxaneyî 30 leşkerên Iraqî dîl girtin, dîsa li Cemcemal û çend deverên dora Hewlêrê dor li hêzên Iraqî girtin, li wir jî 25 leşker dîl ketin. PKK'ê jî bi belavokekê daxuyand ku ewê li hemberî hêzên Sedam, tevî hêzên Başûrî şer bike.

Müdür Kaya/Kurd–A

Beriya şer li sûka Hewlêrê rojeke aştiyê

Berxwedana dîlên Erzerûmê didome

Girtiyên girtîgeha Çanakkaleyê ji raya giştî re daxuyaniyek diyar kirin. Di daxuyaniyê de wiha tê gotin: "Îro, li zîndanan cerd û pêkûtî roj bi roj zêdetir dibin. Lê ev yek ne tenê zêdekirina cerd û pêkûtiyan e. Di bin vê cerd û pêkûtiyê de hesabên cur bi cur hene. Mînaka dawî jî îro li girtîgeha Erzerûmê tê dîtin. Li wir bi îşkence û metodên cur bi cur tê xwestin ku girtî bibin îtîrafkar.

Wahşeta ku di 12'yê îlonê de li girtîgeha Diyarbekir û yên din hatibûn kirin îro li girtîgeha Erzerûmê tê kirin. Bi van îşkence û cerd û pêkûtiyan tê xwestin ku girtî teslîm bibin. Di girtîgehê de girtiyan xweşewitandin jî tê de, berxwedanên cur bi cur bi kar anîne. Lê ev berxwedan nayên eşkerekirin û ji raya giştî tê veşartin. Em girtiyên girtîgeha Çanakkaleyê yên ji dozên cur bi cur vê wahşetê protesto dikin."

PKK, MLKP-K, TKEP, TKP/ML-TİKKO, TİKB, DY

Xwîn herikî heta çokê

Gerîlayên ARGK'ê li Sason û Pasûrê, dest bi livbaziyên mezin kirin. Tê gotin ku, gerîlayan bi tarza şerê gerîlayan a bi hereket ev cure livbazî kirine û ev livbazî îsal wê li her herêmê çêbin.

Li gorî agahiyên Kurd-A'yê livbazî wisa qewimîne: "Roja 5'ê adarê saet li 6'ê sibehê, li Pasûrê, li ser gundê cerdevanê Şêx Hemza û leşkerê qereqola seyar, gerîla dest bi êrîşekê dikin. Di êrîşa gerîlayan de 8 leşker û 2 gerîla dimirin. Piştî vekişandina gerîlayan, cerdevanên Birikam yên ku ji bo alîkariyê tên, dikevin kemîna gerîlayan. Di kemînê de sercerdevanek û gelek cerdevan tên kuştin. Piştî kemînê, gerîla vedikişin mintîqeya Girê Sor. Li Girê Sor jî di navbera gerîlayan û cerdevanan de şer dertê. Şer heya êvarê didome û di şer de 3 cerdevan û gerîlayek dimirin, gerîlayek û 11 cerdevan birîndar dibin. Li hêla din, di navbera Pasûr û Sasonê de konvoyeke leşkeran dikeve kemîna gerîlayan. Di kemînê de 2 cemse ji aliyê gerîlayan ve bi roketê tê tehrîpkirin. Di cemse û gulebarana konvoyê de 27 leşker dimirin, gelek leşker birîndar dibin. Dîsa li Sasonê gerîla davêjin ser qereqola Herabê û di ser girtinê de 6 leşker dimirin. Di eynî roj de gerîla qereqola Çaçasê gulebaran dikin. Di gulebaranê de 2 leşker dimirin. Gerîla di riya Sasonê de konvoyeke leşkerî gulebaran dikin. Cemseyek îmha dibe, gelek erebe û cemse derbeyan distinîn. Der heqê mirî û birîndaran de agahî bi dest neketin."

Li Xana Hewêl şerê mezin

Ji 28'ê reşemiyê û bi vir de li çiyayên Mirgelan, Siser û Quliserê di navbera gerîlayên ARGK'ê û hêzên dewletê de şer didome. Di van rojan de 36 leşker û 19 cerdevan mirine, der heqê zaiyatên gerîlayan de agahî tune ne.

Gerîlayên ARGK'ê li çiyayê Mirgelan, Siser û Quliserê di cerd û kemîna de nêzîkî 30 leşker û 19 cerdevan kuştin. Piştî van cerd û kemînan, hêzên dewletê bi helîkopterên Skorskî û Kobra çiyayê dora Xana Hewêl bombe dikin. Ji ber bombekirinê riyên gundên derdora navçeyê xera bûne û hatine girtin. Leşkeran xwestin ku riyên ku hatine girtin, vekin.

Gerîlayên ARGK'ê êrîşî grayderên YSE'ê kirin, grayder tehrîb bûn, şifêrek birîndar bû. Piştî vê êrîşî gerîlayan lîseya Xana Hewêl bombe kir. Di lîseyê de tîmên taybet û leşker bi cih bûbûn. Di bombekirina lîseyê de der heqê mirî û birîndaran de salox negihîştin destê me. Dîsa li çiyayên Mirgelan leşker li mayinên gerîlayan qelibîn, 6 leşker mirin, gelek birîndar bûn.

Li gorî agahiyên çavkaniyên herêmê, ji bo alîkariya operasyonê ji Düzceya Bolu 5-6 otobus komando hatine Xana Hewêl. Nexweşxaneya Bilîsê jî, ji ber birîndarên hêzên dewletê ji sivîlan re qedexe ye.

Navenda Nûçeyan

DIK

Cendirme û cerdevan li ser kûçikan bi hev ketin

Li gundê Yukarıbalçıka ku girêdayê Bêgirêye (Özalp), cerdevan û leşkeran li ser kûçikan munaqeşe kir, piştî demekê ew bû şer û di şer de cerdevanek mir, yek jî birîndar bû. Roja 7'ê adarê saet nêzîkî 12.00'yan, cendirme diçin gundê Yukarıbalçıkê, li derveyî gund kûçik êrîşî wan dikin û bi cendirmeyekî digirin. Cendirme li ser vê yekê kûçik dikujin. Cerdevanê xwediyê kûçik û cerdirme li ser kuştina kûçik munaqeşeyê dikin. Munaqeşe dizivire şer, di şer de cerdevanekî bi navê Hakim Pay dimire, Mehmet Salih Akan birîndar dibe. Tê gotin ku birîna Akan xedar e.

Navenda Nûçeyan

KURTENÛÇE...KURT

Cerdevanan helîkopterek Skorskî xistin

Li gundê Eynê ku girêdayiyê navenda Sêrtê ye, cerdevanan helîkopterek hêzên dewletê xistin, nêzîkî 100 cerdevan bi sedemê bûyerê hatin binçavkirin û pirsiyariya wan didome.

Li gundê Eynê, cerdevanên gundê Çêlik di 2'yê adarê de, biroj helîkopterek xistin. Dema cerdevan bi Bîkîsî û topên Hawanê lîstika şer dikin, helîkopterek Skorskî li çola gundê Eynê ji bo kifşê fira dewriyeyê dike. Di lîstika cerdevanan de helîkopter derbeyê distîne û dikeve. Li gorî agahiyên ji çavkaniyên herêmê, di bûyerê de albayek û 10 leşker mirin. Piştî xistina helîkopterê hêzên dewletê nêzîkî 100 cerdevan xistin bin çav û pirsiyariya bûyerê didome.

Welatê Me/ Êlih

500 cerdevanî çekên xwe danîn

Li Çêrmûga Amedê, nêzîkî 500 cerdevanî roja 3'yê adarê çekên xwe danîn. Gelek cerdevanên din jî, ji bo sîlehberdanê haziriya xwe dikin.

Li Çêrmûgê nêzîkî 500 cerdevanî ji ber cerd û hakaretên qumandêr û bêdiliya derketina operasyonan dev ji cerdevaniyê berdan. Li gorî agahiyên ku bi dest ketin, Binbaşî, cerdevanan li bexçeya Qumandariya Cendirmeyan ya Navendî dide hev û ji wan dixwaze ku tevî leşkeran derkevin operasyanan. Dema cerdevan derketina operasyonan qebûl nakin, qumandar ji wan re çêr û dijmînan dike. Piştî vê bûyerê cerdevan sîlehên xwe teslîm dikin û dev ji cerdevaniyê berdidin.

Navenda Nûçeyan

Ji bo çapemeniya tirk kurd tev 'terorîst' in

Heftiya borî li Merzîfona Amasyayê, ji alaya 299'an 7 leşkerê kurd piştî terhîsê hatibûn girtin. Çapemeniya tirk girtina wan bi şêlandina cebilxanê ve girêdabû. Piştî bûyerê, hevalekî wan leşkeran bi telefonê li me geriya û bi me da zanîn ku leşkerên hatine girtin ne ji ber şêlandina cebilxaneyê, lê ji ber nivîsên di defterên wan yê bîranînê de, hatine girtin. Leşkerên ku hatine girtin, Erce Demirel (74/3) Muş, Fetah Özmen (74/3) Amed, Hikmet Artan (74/2) Cûlemêrg, Ali Üste (74/3) Ruha û 3 kesên din.

Navenda Nûçeyan

Polîs ji xwe re nasekinin

Li Edeneyê, piştî kuştina 5 muxbîran, hêzên dewletê li ser taxê kurdan dest bi cerd û pêkutiyên dijwar kirin. Li gorî agahiyên ku bi destê me ketin, polîs û tîmên taybet ketûber diavêjin ser malan û kurdan dixin bin çav.

Li taxa Anadoluyê, polîsan avêtin ser malên Kadir Göktai, Şeyhmus Özmen, Raife Uçar û ew xistin bin çav. Piştî girtina ser malên wan polîsan bexçeyên malan kolane. Di kolandina bexçeyan de polîsan tu tişt nedîtin. Malbatên Kadir Göktai, Şeyhmus Özmen û Raife Uçar ji jiyana wan endîşeyê dikin û daxwaza berdana lêzimên xwe dikin.

Navenda Nûçeyan

www.arsivakurdi.org

Navên **10** kesên ku di xaçepirsa hejmara 15'an de peyva veşarî **'Konevanî'** dîtine û pirtûka **"Siya Evînê"** qezenc kirine:

Nezir Ararat
Kadıköy/İstanbul

Eşref Beyhan
Bağcılar/İstanbul

Veysi Yeşilkaya
İzmir

Ali Durç
Karataş/İzmir

Yıldız Çiçek
Basmane/İzmir

Enver Zeren
Adıyaman

Şilan Selçuk
Hatay

Mehmet Demir
Niğde

Yadigar Coşkun
Diyarbakır

Xalê Eliyê Gavan
Nîs/Yugoslavya

Malbatên girtiyan diqîrin:

'Emê xwe bişewitînin'

Li Elbîstan û Konyayê girtî ber bi mirinê ve diçin. Li Konyayê 2 girtî ji ber xwînvereşînê di sînora mirînê de ne. Girtiyan greva birçîbûnê zivirandin greva mirinê. Ji ber vê yekê malbatên girtiyan roja 25'ê reşemiyê li Komeleya Mafên Mirovan civîneke çapemeniyê li dar xistin.

Li Edeneyê malbatên girtiyan, pêkutiyên li ser girtiyan protesto kirin.

Roja 25'ê reşemiyê, malbatên girtiyên Konya, Elbîstan û Meletê ji bo ku piştgirî bidin lêzimên yên girtî li Komeleya Mafên Mirovan Şaxa Edeneyê, civîneke çapemeniyê li dar xistin. Pişt re jî, roja 27'ê reşemiyê CHP'ya Edeneyê dagir kirin.

Beriya demekê kurt, ji bo mafstandinê, girtiyên ku li Meletê, Elbîstan û Konyayê ketibûn greva birçîbûnê û bi berxwedana xwe mafê xwe standibûn. Lê rêvebirên girtîgehan piştî çend rojan dîsa dest bi zilm û zordariya xwe kirin û mafên ku girtiya bi berxwedana xwe standibûn xesp kirin. Ji ber vê yekê li gelek deveran girtî dîsa ketin greva birçîbûnê û greva mirinê.

Li gorî agahiyên ku ketine destê me, li Elbîstan û Konyayê girtî ber bi mirinê ve diçin. Li Konyayê 2 girtî ji ber xwînvereşînê di sînora mirînê de ne. Girtiyan greva birçîbûnê zivirandin greva mirinê. Ji ber vê yekê malbatên girtiyan roja 25'ê reşemiyê li Komeleya Mafên Mirovan civîneke çapemeniyê li dar xistin. Roja 27'ê reşemiyê jî bi beşdariya nêzîkî 100 kesî CHP'ya Edeneyê dagir kirin. Ji bo rewşa girtiyan, malbatên wan ji Welatê Me re mijûl bûn û tadeyiyê ku li ser girtiyan dibe, anîn ziman.

Rewşa ku îro girtî tê de ne wiha ye;

– Dema malbat diçin hevdîtina girtiyan, piştî demeke kurt elektrîk tên birîn.

– Xwarin û vexwarinên ku li kantînê tên firotin, dema malbat dibin girtîgehê nayên standin.

– Nameyên ku ji girtiyan re tên, tên qetandin û nakeve destê wan.

– Rojname, pirtûk û kovar nayên standin.

– Kîloya çayê ku li derve 180 hezar e, di girtîgehê de li kantînê bi 800–900 hezarî tê firotin.

– Ji ber şertên paqijiyê spî ketine serê girtiyan û pora wan diweşe.

Piştî van zordariyên li ser girtiyan, malbatên wan wiha gotin: "Di dawiya vê tekoşîna me de mirin jî hebe, emê têkoşîna xwe berdewam bikin. Ku mafên zarokên me neyê dayîn, emê li ber girtîgehan xwe bişewitînin."

Welatê Me/ Edene

Malbatên girtiyan roja 25'ê reşemiyê li komeleya mafên mirovan civîneke çapemeniyê li dar xistin û gotin: "Em ji rê dernakevin"

Xaçepirsa me bixelat e. Di 15 rojan de çi bersiv bigihîjin me, em dinirxînin. Xelat bi usûla qurayê li deh kesan tên belavkirin. Xelata hejmara 17'an; pirtûka **Yusuf Kaynak "Bi Kurdî Navên Mirovan"** e. Ev pirtûk ji aliyê weşanxaneya DOZ'ê ve hatiye çapkirin.

Jêrenot:
Ji bo ku bersiva we bê nirxandin, divê hûn "Peyva Veşarî" di nava qutiyên li bin xaçepirsê binivîsînin û tevî adresa xwe ji me re bişînin.

Xelata Xaçepirsê

"Bi Kurdî Navên Mirovan"
Yusuf Kaynak

XAÇEPIRSA BIXELAT (15)

PEYVA VEŞARÎ → K Ô N E V A N Î

XAÇEPIRSA BIXELAT (17)

PEYVA VEŞARÎ → 1 2 3 4 5 6 7 8

Filistînî jî xwedî mafê ewlehiyê ne

Y. Arafat: "Piştî cengeke dûvdirêj bi aştiyê me mafên meşrû yên filistîniyan bi dest xistin. Têkoşîna me bû ya herî dirêj a dîroka hemdem. Zarokên intîfadayê li hemberî artêşa herî bihêz a Rojhilata Navîn li ber xwe dan. Serfiraziya 1973'an jî têrê nekir ku doza me bibe navneteweyî, feqet bi aştiyê, gelê filistînî di xerîteya jeopolîtîk a dinyayê de bû xwediyê cihekî."

Ji kovara Al Ahram Hebdo Xalid Saad Zaxlûl bi Serokê Rêxistina Rizgariya Filistînê (RRF) Yaser Arafat re hevpeyvînek çêkir. Ev kovara hefteyî ku li Misirê derdikeve û zimanê wê fransewî ye di hejmara xwe ya 25'an (1–7 Adar) de nêzîkî rûpelekê cih daye hevpeyvîneke bi Yaser Arafat re. Em vê girîng dibînin û wergera wê ya bi kurdî diweşînin.

Îzak Rabîn îdîa dike ku terorîzm nahêlê aştî bikeve rê (sebebê bicihnebûna aştiyê terorîzm e) û ji we dixwaze ku hûn pêk bînin. Hûn li ser vê yekê çi difikirin?

Y. Arafat: Behsa kîjan ewletiyê dike? Ji dema îmzekirina prensîbên Danezanê (Danezana aştiyê) ve hejmara kuştiyên îsraîlî ji 110'an derbas nebûye, lê yên filistîne 141 in. Îcar ji me herdu aliyan kîjanî zêde zerar dîtiye? Lazim e ez ji Îsraîlê bixwazim ku ewletiya me pêk bîne. Divê behsa ewletiya vî aliyî an jî wî aliyî xweser neyê kirin. Di vê pêvajoya aştiyê de divê behsa ewletiya herdu aliyan bi hev re bête kirin, ewletî di vê gavê de hevpar e. 52 kuştî û 250 birîndarên filistînî yên qetlîama Hebronê nebûn asteng li pêşiya berdewambûna hevdîtin û netîceya lihevhatina Qahîreyê. Heta, di ser re jî, serokatiya filistînî, ku hewl dide pêvajoya aştiyê bigihîne encamê (bibe serî), tedbîrên pêwist standin ji bo ku careke din hedîseyên wisa neqewimin.

Hûn dikarin îsraîlî û amerîkaniyan serwext û qayil bikin ku wê terorîzm xelas bibe?

Y. Arafat: Ez nikarim dawî li terorîzmê bînim. Feqet, li aliyê din ez dikarim hurmetê ji şertên peymanê (lihevhatinê) re bigirim. Dema ez li Beyrûdê bûm, min musade neda tu grûbên filistînî û Lubnanî ku di sînor re êrîşan pêk bînin. Yanî, em vaad û peymanên xwe îhlal nakin. Lê bi wî şertî ku Îsraîl jî erdên ku îşgal kiriye vekişe û hêzên xwe yên mayî jî bixe bin xizmeta Serokatiya Filistînî da ku em karibin hilbijartinan li dar bixin. Bi rastî jî, pirsgirêk, berevajiyê ku ew îdîa dikin, ne çareseriya ewlekarî lê ya siyasî ye. Ew jî, ji tatbîqkirina lihevhatinê pêk tê.

Alîkariyên diravî (peretî) yên dewletên ereb?

Y. Arafat: Mixabin, tenê Suudî Erebîstan li ser soza xwe sekinî.

Dewletên Yekbûyî (Amerîka) çawa ye?

Y. Arafat: Wan soz dabûn ku 125 milyon dolar bidin me. Heta niha me jê 25 milyon standine.

Ji bo we tiştê ku aştiyê temsîl dike çi ye?

Y. Arafat: Piştî cengeke dûvdirêj bi aştiyê me mafên meşrû yên filistîniyan bi dest xistin. Têkoşîna me, bû ya herî dirêj a dîroka hemdem. Zarokên intîfadayê li hemberî artêşa herî bihêz a Rojhilata Navîn li ber xwe dan. Serfiraziya 1973'an jî têrê nekir ku doza me bibe navneteweyî, feqet bi aştiyê, gelê filistînî di xerîteya jeopolîtîk a dinyayê de bû xwediyê cihekî. Bi xêra aştiyê Misirê Sîna bi paş ve stand. Yanî qerara aştiyê ya ku gelê filistînî stand, bû qerareke stratejîk.

Hûn ji aştiyê çi fêm dikin?

Y. Arafat: Aştiya rasteqîn ev e ku li ser hîmê ewletiya hevpar, hevnasîn û pêşveçûnê ava bûbe.

Îro pêvojoya aştiyê gihaye kîjan dereceyê?

Y. Arafat: Herkes dizane ku bêmutabaqatiya Îsraîliyan aştî xistiye nava astengekê. Pêkanîna pêngava duyemîn a peymana ku li ser ji nû ve bicîhkirina hêzên îsraîlî û li darxistina hilbijartinên filistînî bû, ma tarîxeke din. Taloqkirina hilbijartinan, li hemberî aştiyê îhlalkirina hin şert û pêderiyên peymanê nîşan dide.

Pirsgirêka Qudusê di çi merhaleyê de ye?

Y. Arafat: Îsraîlî bixwazin nexwazin, Qudus niştimana min û ya hemû filistîniyan e. Ew parçeyek ji erdên filistîniyan e ku di 1967'an de hatiye îşgalkirin. Wekî din li ser qerarnameya hejmara 242'yan ya Neteweyên Yekbûyî ku bingehê hevdîtinên Madrît û Osloyê teşkîl dike, ev rastî hatiye nivîsandin. Dawî, di zîrveya îslamî de jî ev pirsgirêk bi qerarekê ve hatiye girêdan.

Werger:
MAZHAR GÜNBAT

REWŞA DINYAYÊ

ROBÎN REWŞEN

NATO û Rojhilata Navîn

Di van demên dawî de li civînên navneteweyî yên li ser ewlekariyê, ewçend rasterast (yekser, dîrekt) mijara rojevê nebe jî, li ser NATO'yê ango Rêxistina Peymana Bakurê Atlantîkêyê pir gotûbêj dibin. Di van gotûbêjan de zêdetirî rol û pêşeroja NATO'yê, rola Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê (DYA) û firehkirina sînorên NATO'yê ber bi Rojhilatê Ewrûpayê ve, tê munaqeşekirin. Ew armanca ku NATO li ser ava bûbû ji holê rabûye, mercên nû derketine holê. Mîna ku tê zanîn hîma NATO'yê (Rêxistina Peymana Bakurê Atlantîkê) piştî Cenga Cîhanê ya Duyemîn hatibû danîn.

Deh dewletên Ewrûpî (Belçîka, Danîmarka, Fransa, Holanda, Îngiltere, Îtalya, Holanda, Luksemburg, Norwec, Portekîz), DYA û Kanadayê ji bo avakirina parastina hevpar li dijî Yekîtiya Sovyetê di sala 1947'an de dest bi pêwendiyan kiribûn. Piştî çend salên din jî NATO ava bûbû û endamên wê zêde bûbûn. Yekîtiya Sovyetê jî di sala 1955'an de pakteke alternatîf, pakta Warşowayê ava kir.

Piştî hilweşîna Yekitiya Sovyetê sedema hebûna NATO'yê ji navê rabû. Lê, îro NATO ji berê bihêztir e. Ev yek, ya duduyan dewletên navend û rojhilata Ewrûpayê –ku berê dijminê NATO'yê bûn– niha dixwazin bibin endamên NATO'yê û di vî warî de pir bi israr in. Ya sisiyan, dewletên ku pêşî qaşo bêalî bûn, îro bêîstikrarbûna Rûsyayê ji xwe re wekî xetereyekê dibînin û dixwazin bibin endamên NATO'yê. Ev fenomên (diyardeyên) nû ne û divê li ser baş were rawestîn.

Piştî rabûna tehdîta Sovyetê, NATO xwe ji tehdîtên nû re amade dike û stratejiyeke nû çêkiriye. Li gorî stratejiya nû di şûna tehdîtên leşkerî de yên siyasî, aborî û ewlekariyê derketine holê. Ku ev tehdît zirarê bidin dewletên endam, divê NATO mudexaleyî wan bike. Ji bo vê yekê jî, NATO hêzên leşkerî yên nû amade kirine. Wekî ARRC'ê ku ev hêz pir zû û rihet dilive. Lewre hatiye çekdarkirin. Dema em bi vî çavî li pirsê binihêrin û bi vê pîvanê binirxînin, Tevgera Rizgariya Neteweyî ya Kurdistanê ji bo NATO'yê tehdît û talûkeyeke (xetere) mezin e. Ev şerê ku îro dagirker li Kurdistanê birêve dibin bi însiyatîfa NATO'yê ye. Perwerdekirina tîmên taybet, li Almanyayê û DYA'yê dibe. Dîsa alîkariya çek û ekonomiyê bêqeder e. "Doza Duseldorfê", provakasyonên 1988'an û êrîşên wê demê bi biryara NATO'yê bûn.

Dewletên Navend û Rojavayê Ewrûpayê ji bo çareserkirina problemên xwe yên civakî, aborî û ewlekariyê serî li NATO'yê didin. NATO ji vê yekê pir dilxweş bû û bi vî awayî dixwest valahiya li herêmê dagire û sînorên xwe firehtir bike. Lê ji ber reaksiyona Rûsyayê rasterast nikaribû serlêdana van dewletan qebûl bike.

Gelo endambûna NATO'yê an Yekîtiya Ewrûpayê wê problemên van dewletan çiqas çareser bike? Ev ne diyar e.

Rûsya jî ji destpêkê ve li dijî endambûna van dewletan û firehkirina sînorên NATO'yê ye. Xuya ye ku hê jî reqabetek di navbera Rûsya û NATO'yê de heye û wê demeke dirêj jî berdewam bike.

FAL

BERAN (21 Adar - 20 Avrêl)

Mirov xwe têkûztir dikin û her bi pêş ve diçin. Tiiştên ku hûn niha negihêjinê hûnê rojekê bi dest bixin. Bi ber xwe nekevin, bipêşveçûyîn di rihê we de heye. Hûnê di demeke kurt de serfiraz bibin.

GA (21 Avrêl - 21 Gulan)

Wê der heqê aboriya we de ji we re xeberek were, li gorî wê xeberê xwe amade bikin. Gelek kes dizanin ku hûn mirovekî taybet in, lê hûn dixwazin ku her kes vê yekê bizanibe. Hewce nake ku herkes bizane, bila haya we ji we hebe bes e.

CÊWÎ (22 Gulan - 21 Pûşper)

Sitêrk bi şevê li asîmên tê xuyan, hûn jî biroj lê digerin, ev tiştekî ne baş e. Divê hûn hinekî realîst bin. Dev ji xewnerojkan berdin, nexwe rewşa we tu car baş nabe.

KEVJAL (22 Pûşper - 23 Tîrmeh)

Hûnê wan rojan derkevin seyahatê. Dibe ku kesekî ronakbîr xwe bi we bide nasîn û di jiyana we de cihekî taybet bigire. Lê gerek e hûn ji bo wî mirovî dev ji gelek xwiyên xwe berdin. Hay ji xwe hebin, nexweşî ji we ne dûr e.

ŞÊR (24 Tîrmeh - 23 Gelawêj)

Zanebûna we ya li ser karavakirinê pir baş e. Di jiyana we de hebûn û tunebûn cihekî girîng nagire. Lê belê ji bo kesên li der û dora ev tişt girîng e. Li gorî vê bifikirin û wan kesan jî bêhêvî nehêlin.

SIMBIL (24 Gelawêj - 23 Rezber)

Mirovên li dor we bi lixwefikirîna we ne kêfxweş in. Hinekî dilê heval û dostên xwe qezenc bikin. Ev ji bo bipêşveçûyîna we pêwist e. Ji ber van hal û hareketên we dibe ku dildara we dev ji we berde.

MÊZÎN (24 Rezber - 23 Kewçêr)

Hûn hinekî tiştên nû difikirin, lê belê gerek e hûn pir lez nekin, wext hê zû ye. Wan mirovên ku dikevine jiyana we, divê hûn baş nas bikin, piştre ya dilê xwe jê re bêjin. Hûn ji tiştekî hevîdar in ewê di demeke kurt de pêk were.

DÛPIŞK (24 Kewçêr - 22 Sermawez)

Rewşa we nediyar, wekî barana biharê; carinan gur dibare, carinan jî hûr û hûr lê dike. Ewqas diltenik nebin, dil tenikî ji kesên wekî we re ne baş e. Bidin ser riyeke nû, bila dilê we wekî pola be. Destmaleke binexş wê ji we re were.

KEVAN (23 Sermawez - 21 Berfanbar)

Dewlemendbûn di giyana we de heye, lê mirov bi dewlemendiyê tu caran ronakbîr nabe. Ji ber wê yekê divê hûn pir bixwînin û zorê bidin xwe. Çavderiyeke xurt, li mirovan guhdarîkirin jî ji bo ronakbîriyê pir pêwist in.

KARIK (22 Berfanbar - 20 Rêbendan)

Ji bo we demeke tijî surpriz dest pê dike. Di vê demê de kesên ku qet we nas nakin jî ji we re surprizan çêdikin, metel nemînin. Şansê we vedibe,hûn jî qîmetê bidin vê firsendê. Ew bihêsanî bi dest nakeve.

DEWLIK (21 Rêbendan - 11 Reşemi)

Erê hûn hemû cazîbeya xwe derdexin holê, pir kes ji vê kêfxweş dibin. Divê hûn hinekî kone bin ji bo ku hinek xêrnexwaz zerarê negihînin doza we. Wê nameyek ji we re were wê baş fêhm bikin. Dildara we wê were we bibîne.

MASÎ (20 Reşemi - 20 Adar)

Li aliyekî malbata we, li aliyê din aboriya we li hemberî jiyana we derdikevine. Wan probleman ku hûn karibin hel bikin, wê di van mehan de pir karên baş derkevin pêşiya we. Li gorî vê rewşê xwe amade bikin, dev ji doza xwe jî bernedin.

Qişt qişt, qijika gurî

Êzêr, lawikekî 11-12 salî bû. Wê rojê jî wekî her caran çû ber rezê xwe, ji bo notirvaniyê. Ber bi êvarê, nihêrî ku qijik bi nikulên xwe tiriyên xweş diherimînin. Êzêr, radibe radihêje tenekeyekê û bi dar lê dixe û pê re "qişt, qişt, qijika gurî" dibêje.

Di vê navê de leşker ji operasyonê vedigerin. Tiştek bi ser nexistine. Tev qehirî ne. Çavsorî bûne. Ji westînê zimanê wan ji devê wan kişiye. Ji bo ku tiştek bi ser nexistine, bela xwe di darûberan didin. Guliyên daran parçe dikin. Bala xwe didin, wa ye lawikek di nava rez de ye û tişt miştan dibêje. Berê xwe didin wî. Dibêjin, heye tune ye yê terorîst revandine ev lawik e.

Çawa diçin balê, dikevin ser dilê wî û lêdixin, ji ber jî: "Sen teröristlere haber veriyorsun değil mi? Bizi görünce tenekeye vurup kaçmalarını söylüyorsun (Tu xeberê didî terorîstan ne werê. Tu me dibînî li tenekeyê dixî û ji wan re dibêjî birevin.)"

Rebenê Êzêr nizane çi tofan hate serê wî. Hema yek ji vî alî, yek ji wî alî lê didin. Nizane bi tirkî bersiva xwe jî bide. Hema ji bo ku xwe xelas bike, gotin motinan li hev diqelibîne: "Na, na...! qomitan, wallah heywanlari qoviyor... (Na, na... qumandar bi xwedê ez heywanan diqewirînim.)" Gava ku Êzêr dibêje heywan, ji qehra dîn dibin: "Ulan teröristlere haber verdiğin yetmiyor, bir de bize yani koskoca türk askerine hayvan deyip hakaret mı ediyorsun? (Ne bes e tu xeberê didî terorîstan, di ser de jî tu ji me re, ji leşkerên tirkan re çêran dikî.)"

Û hîn lê sor dibin û lêdana xwe berdewam dikin. Rebenê Êzêr nikare bi başî derdê xwe ji wan re bibêje û bi ser de jî hîn bêhtir lêxistina xwe jî dixwe.

XÊLYA/Amed

Xalê Elî û bajarî

Xalê Elî ji bo karên xwe diçe bajêr. Kêmasiyên xwe dikire, karên xwe diqedîne. Êvarê jî vedigere gund.

Gundî li serê wî kom dibin. Bimeraq jê dipirsin: "Xalê Elî li bajêr çi hebû, çi tunebû? Xwarin û vexwarina te bila ji te re bin, te çi dîtibe ji me re bibêje."

Xalê Elî demeke disekine û hêdî hêdî bersivê dide gundiyan: "Wele çi bibêjim. Dudo dudo, sisê sisê bihevdu girtibûn. Diçûn, dihatin. Kurtepistek di nava bajêr de hebû. Guman heye ku li bajêr şerekî mezin derkeve."

CEWDET QUŞMAN

Nexweşketina Zahiro

Gotinek di kurdî de heye, heke "çil kes ji mirovekî re bibêjin: "tu dîn î". Ew dirust be jî, dîn dibe"

Rojekê ji rojan, hevalên Zahiro li qehwexaneya navçeyê rûniştine. Yek ji wan dibêje: "Hevalno, werin em tinazê xwe bi Zahiro bikin." Hevalan gotin: "Em çi bikin?" Yekî ji wan got: "Em hemû heval ji Zahir re bibêjin: "Zahir qey tu nexwş î, çi bela te ye? Çima wilo rûyê te spîçolkî bûye?"

Hevalan hevdû girt. Çûn ba diya Zahiro, gotin: "Dayê, em dixwazin henekekê bi Zahiro bikin. Me neşikîne, dema Zahir sibe hate malê, jê re bibêje: "Kurê min çi bi te hatiye. Reng li ser te nemaye".

Roja din, Zahir hat qehwexaneyê, çû maseya ku pêşî leqayê (rastî) bû silav da û rûnişt.

Yên li ser maseyê bi setrencê dilîstin. Yekî ji wan, wekî ku di nava xwe de biryar dane got: "Hevalê Zahir, derbasbûyî be. Xêr e qey tu nexweş î çima madê te zer bûye?"

Zahir got: "Na wele, ez ne nexweş im. Min xaniyek bi qebale girtibû, min seyand, xwarin xwar û ez hatim."

Piştî çend deqan, rabû çû masayekê din. Wan jî bi hev re gotin: "Wey wey kuro Zahiro tu ji textor têyî.? Çiqas rengê miriyan bi te ketiye! qey tu nexweş î?"

Zahir got: "Wele hinekî zikê min diêşe, lê ne ewqas nexweş im."

Dema bû êvar; Zahir çû mala xwe, dayika wî dilê hevalên wî nehişt. Got: "Kurê min Zahir çi bi te hatiye? Rengê te çiqas xera bûye."

Çawa Zahir ev gotin bihîst; xwe avêt nav nivînan. Got: "Hawar e dayê ez mirim, ez pir nexweş im, lihêfê bi min de bike,"

Zahirê reben heft rojan di nav nivînan de ma.

Berhevkar:
HESEN ZINAR

Di zîndanên wehşetê yên Diyarbekirê de li hemberî zilmê ji bo rojên birûmet pir canên ciwan xwe feda kirin

DIYARBEKIR! DIYARBEKIR!

Gava ku generalên tirk di 1980'yî de derbe çêkirin, êdî hemû girtîgeh bûn laboratuareke zilmê. Lê belê girtîgeha Diyarbekirê di vî warî de ji hemûyan "pêşketîtir" bû. Generalên faşîst, hîna di ser derbeyê re mehek derbas nebûbû, sêpî li dar xistin. Piştî wê rojê êdî darvekirin bû karekî rojane.

Li Diyarbekirê rewş zêdetir hate guhertin, jiyan li wir êdî ji derî tehemûla mirovan bû. Êdî tu kesî nekarî ku bi dilê xwe bimire jî. Ew jî bi destûra îşkencevanan bû. Gava ku Başçavuş Mevlüt AKKOYUN bû fermandarê hundirê girtîgehê, van tiştan dest pê kir. Êdî hemû girtî dî saet 5'ê berbangê de derketin hejmartinê, lêxistin û îşkenceyê dest pê dikir heya razanê. Li ser wê yekê 1'e rêbendana sala 1981'an hemû girtiyan dest bi greva birçîtiyê kir. Di roja 3'yan de Midûrê girtîgehê Alaattin Bayar bû fermandarê hundirê girtîgehê Mevlüt Akkoyun tevî hemû leşkerên xwe cerdî ser girtiyên di greva birçîtiye de, kirin. Ji xeynî 3 kesan hemû girtî, piştî wan îşkenceyan ji bîr ve çûn.

Îşkence êdî qet li ser girtiyan ranebû. Her roj, ev zilm hîn gurtir tekrar dibû. Ji girtiyan re rûniştin, razan, xwarin, vexwarin her tişt qedexe bûbû. Êdî domandina vê rewşê ne mumkûn bû. Di reşemiya (meha 2'yan) 1981'an de fermandarê hundirê girtîgehê hate guhertin. Esat Oktay Yıldıran hate cihê Mevlüt Akkoyun. Piştî hatina Esat Oktay, girtîgeh ji îşkencexaneyên polîsan xerabtir bû. Falaqa, ava cemidî, lêdan, gû danxwarin, mişk danxwarin û hwd. ku mirov kirinên nava hemû zindanan bîne cem hev, rewşa girtîgeha Diyarbekirê ji zindana Saygonê nebaştir bû. Li wir êdî ji bo girtiyan sibe tunebû, tenê ev dem hebû. Tu kesî nizanîbû ku wê piştî gaveke din çi bibe. Kî dimire, kî dimîne. Ew qet ne kifş bû. Li dijî vê hovîtiyê di destê girtiyan de yan berxwedan an jî mirin hebû. Ne mafên mirovahî ne jî hiqûqê li ser van hovan tesîrek dikir. Ebûqat û girtî li hemberî mehkemeyê wekî hev bûn. Ebûqat tenê dikaribûn 30 saniyeyî bi miwekîlên xwe re mijûl bibin. Hemû rewşenbîr û ronakbîr an xistibûn hundir an jî fîrarî bûbûn. Bi kurtasî; hemû êrdima di bin hukmê TC'yê de bûbû zindaneke mezin. Vê carê zordestî ji berê zêdetir bû. Dema tesîra wê ji ku derbas dibû, ev car dîsa zordestiyê dest pê dikir. Li dijî vê hovîtiyê 9 girtiyan dest bi greva birçîtiyê kir (sala 1982'yan, 2'yê adarê). Mazlum Doğan şeva 21'ê adarê xwe bi dar ve kir. Roja 30'yê adarê gerînendeyê girtîgehê li Kemal Pir îşkence kir. Piştî 44 rojan şertên girtiya hatin qebûlkirin. Lê tu tişt neguherî. Êdî li ber çavên girtiyan tu tişt nehat dîtin. Şeva 18'ê gulana 1982'yan bi boyax û tînera ku ji bo resiman dabûnê 4 girtiyan agir berdan xwe, dema girtiyan xwestin êgir bitemirîmin, dengê wan bilind bû: "Avê li me nekin ! Agir har bikin!"

Êdî dengê girtiyan li der hate bihîstin. Lê dîsa jî zordestî kêm nebû, heçî ku çû zêde bû. Li ser wê yekê roja 14'ê tîrmeha 1982'yan Kemal Pir, M. Hayri Durmuş, Akif Yılmaz û Ali Çiçek dîsa dest bi greva birçîtiyê kirin. Piştî 36–40 rojan her çar heval jî şehîd bûn.

Zindana Diyarbekirê incex piştî van mirinan hate guhertin. Lê her tişt bi xwînê hate standin.

EZNAS MAYA

BALA

Bo şehîdêk, dwan, siyan û çwar
Ewsa min herdû çawanim
Ekirde dû coge û rûbar
Min ewsake
Bo malêk û bo gundêk û
Bo baxçeyekî cwanemerg
Em taqe dilem ekirde,
Pele hewrêkî payize...
Ey êstake, bo pênc hezar
Çon bitwanim dû çaw bikem,
Be pênc hezar gom û derya
Dû des bikem,
Bo pênc hezar kolewijî reş helgeraw..
Qûrgê bikem be pênc hezar gerûy tasaw..
Min ezanim, a em jan e,
Wişem ebate gilewe û
Hergîz pence,
Lawandinewey çend dirêj bê,
Nagate balay HELEBCE...

ŞÊRKO BÊKES

Dewanê Dêrsim de verva vêsanêni (ZAZAKÎ)

Sera parêne Dêrsim rê serê de adirê viye. Pancas û ses serê ra dime reyna dewî vêsnay. Mordêm kerd vînd, adir kerd birê, adir kerd çêyan. Reyna pukeleka zilmê ma ser a vêrd şî. Eve cil û cor, eve qav û qeçax, eve mal û gay, çêy vesnay û riznay. Dewî kerd tip û tol, tê de kes niverda. Tayê şî çê mordemanê xo tayê bar kerd şî şaristananê (sukunê) Tirkiya. Deva deve ses hot asmî yo ki dewî gurete binê ambargoyî vesaniye. Nan, eve loqme ve loqme, ardan, eve telîse ve telîse, zovîna çiyê wordêne û payderkene yew bi yew (ju ve ju) morêne dane. Par pêrar û seranê virênan di, dewizan her yetaze xo payîz ra ardene hurendî. Çimkî zimistan vore vorena ray gêriyênî (bena qapan), tawaye nêno, nireseno, hurend. Esmer taway werdene û paykerdene niverda siro dewan.

Ew ro Dêrsim de her ca binê vore de ro. Tawaye nisono, nireseno dewan. Dorme suka mamekiye ra bijêre, heta dewanê Pulur (Ovacix), Xozad, Mazgerd û Pulemuriye tê de na tengay oncenê.

Muradê dewlete owe ketol be qe kes nimano. kes nimano kowan ra, qiflê sevkana bêpaşt û bêdiyax bimano. Hona çiyo ke nêno mordemî virî, nêkenê. Nejdî pancêse ra avêr, pirdê dewa Pax vesna. Dewa Pax nejdiyê Mamekî de dewanê pîlan ra yew a. Dewijî suke ra, na pirdêy ser ra vêrenê bover, sonê dewa xo. Duste jara Anafatma der o. Wext yena kedi hîre dewî, na pirdêy ra yenêsonê. Nika na pirde hurendî de çîno. Mordemanê dewleti vêsna kerd xirave şî. Pê kene ke yewo ke dewa xo de mendo, wo kî ca verdo sero. kamcî hêt ra qayît benê qayît bê, her hêt ra hervode qilerin o. Sarê kurmanc re hervê merdeno û mendeno yo.

Honde zilum ra, hunde hawadîsan ra xevera kamî esta? Medya têde bine lape MGK û dewlete der a. Eke qal bosna ra, Çeçenya rabeno ra, mezal kês nidane. Heto bîne raçimane ine ver de honde bayêy benê, honde dewî wortera darîne we, honde mordemî bîne vînd, honde bir veseno, kes ne kitaban nisneno, ne kî Tv de tawaye asnenê.

Ew ro Dêrsim şiyane ra kî, dewlete îzne nidana. Yewo ke serva musayena raştiye şêro, nîşîkîno zerê suka Dêrsim koyo Dêrsim esmer tenge der o.

Malê dewanê veseyan kam î guret?

Yeno ra sima virî. Hîrê asmî aver bi. Nê biyayey hên ke bî jêdey, paşayê Misirî yê bile heşiya pê. Medyay burjuvazî xêlê ca da ci. Yi rozo worte a timilê de, worte a milamatê de çi bi çi, çi nebî. Zaf çî çiman ra rema, zaf çî serê kesî niguret.

Hîrê çar asmî ra ver bi. Dewê Dêrsimî bine lingan de şiyenhe. Her ca miz û duman bi. Kile dîna guetbî. Dewanê veseyan ra şiqasiye milet amenê. Nê rojan de tejîr bî pêda. Worte a tenge hu ajiye de, teyna kara xo başav kerdene. Dewize ke tenge de mendê, mal û gayhe dine sanano xo ver berdene. Her çî belas bi. dewizî a tenge de mutazi di qurusan bi. Tejirî biyene sa na hal ra, ci re roz vejaybî. Kara xo qirtike de viye. Tayê yînî Dêrsim ra bî, tayê zîSivirek ra ameybî. Sare yew bize 500 hinzar, sarê mangê 1.52 milyonî ra day arhe berdî. Vatene "kurucu"ye. Roza niyanen dena qesa mordem çitur bikero?

Heta ju ra kî wayirhe araban tayinan nê bêbextên kerde. Yetazê mileti bi ke jêde barkerdene rê fiyat berz e. Letê cil coro ke kilê ver ra xelişiya, wo kî sare dewizan rhe bi qêda. Yanê worte tenge d, tenge vejiyhe. Qesa Pîr Sultanîyena ra ison vir: " kenmerhe na sarî qe niginenne mi/ Îlam gula dostanmi re dirvetiya."

S. BUGER

LI GORÎ REWŞENBÎRÊ KURD HÜSEYİN KARTAL, EWRÛPA JI BIN

'TEKNÎK Û DÎWARÊN BETONÊ TÊ

Em hemû eynî tiştî bêjin, nikarin rê e însan di mejiyê xwe de expermentan (ceribandin) çêkin. Di wênekêşiyê de wilo ye, di felsefeyê de, di xebata saziyan de wilo ye, di hemû beşên jiyanê de expermenî (ceribîn) û rexne pêwist in. Rexne ne îla negatîf e. Mesela carinan ji rewşenbîran jî, rexneyên pir vala tên. Girîng e em metodên rexneyê jî zanibin. Vê dawiyê prosesekî rexnekirinê dest pê kiriye. Kurd hêdî hêdî mejiyê xwe vedikin. Berê tirs hebû, ez rexne bikim, wê çi bibe? Halbûkî raman bêyî rexne bi pêş ve naçe. Girîng e di mejî de teqîn çêbe.

Nêzîkî 15 salan e ku hûn li Ewrûpayê ne. Piştî hatina vir, ji rêzêbûnê, derbasî rewşenbîriyê bûn, çand û jiyana Ewrûpayê li ser kurdîtiya te çawa bandor kir, ev bandor erênî bû an jî neyînî bû?

– Vê gavê meseleya rewşenbîrî teng tê fêmkirin. Mesele ne hilgirtina kaxez û pênûsê ye. Rewşenbîr girîng e riyeke nû veke û ew li pêşiya civakê bimeşe. Lê li nava kurdan piranî gel li pêş rewşenbîran meşiyaye. Yanî di vî warî de rewşenbîrî bi serê xwe jirêzêbûnek e.

Di meseleya tesîra Ewrûpayê de ez karim bibêjim, hinek tiştên pozîtîf hene ku mirov dikare ji wan bistîne. Lê belê, tiştên negatîf (neyînî) jî hene. Mirov nikare bêje ku mirov herdem aliyên herî pozîtîf (erênî) digire. Mirov nikare van bi awayekî tûj ji hev biqetîne jî. Ez dibêjim, ji aliyê metodîk ve, ji aliyê ramanê ve, ji aliyê pêşvecûnê ve, însanên me yê niha li ser xwe ne û ji Ewrûpayê feyde girtine. Lê însanên ku, aliyên negatîf girtine, xwe nêzî rewşenbîriya nû ya ku wan bi welêt girê dide nakin. Karên ku dikin jî, nagihîje civaka kurd.

Baş e, em vê meseleyê li ser şexsê te bigirin, ji bo xwe tu karî çi bibêjî, ev tiştên te li jor gotin, ji bo te li kîjan aliyî disekinin?

– Rast e hinek guhertin li min çêbûn. Lê dîsa ez dikarim bibêjim, piştî salên 86–87'an nêzîkbûna min ji welat re pirtir çêbû. Ev jî, bi tevgera azadiyê ve girêdahî ye. Mirov serhildana welatê xwe fêm bike, vê di mejiyê xwe de bi cih bike, dûrbûna kîlometreyan pir ne girîng e. Li Kurdistanê rewşenbîr hene xizmeta dijmin dikin, hemû cehş û cerdevan li Kurdistanê ne. Xizmeta welat bi dûrbûna welat ve ne girêdahî ye. Em dibêjin ji rewşenbîran re: "Cihê ku tu lê disekinî li gel û li welat çiqas dûr e? Ev jî bi mêjî û bi xebat tê pîvan." Problem di wir de ye, nêzîkbûna laş ne girîng e. Em karin bibêjin hinek laş û ten ji nav me çûne, lê hê jî şewqa wan riya me ronî dike. Ji Vedat Aydın bigire heta Apê Musa, ji pir kesên ku di nava me de ne, zêdetir roniyê didin me.

Me behsa tesîra Ewrûpayê dikir...

– Ji aliyê metodên zanistî ve Ewrûpayiyan gaveke mezin avêtine. Pir pir ji berî me dest bi van tiştan kirine. Girîng e em ji aliyê metodê ve ji wan feydeyê bigirin.

Ev ji bo kurd û civakên rojhilatî tenê wisa ye?

– Wan sêsed sal berî me dest bi xebatê kirine. Şoreşên burjûwa, ya sanayî û yên din temam kirine, yanî pêşketineke ramanî çêkirine. Ekol çêkirine. Ekolên şexsiyetên mezin hene, ekolên mekteban hene. Mirov dema qala felsefeyê bike, nikare di ser Kant re derbas be, di ser Hegel re derbas be, di ser Marks re derbas be. Mirov qala psîkolojiyê bike, nikare bibêje: "Freud tiştekî neaniye". Çawa ku mirov gava felsefeya kevin dide ber xwe, felsefeya BZ.'ê, mîna Konfîçyûs, mîna Arîstoteles, çawa mirov nikare di ser re derbas be. Hinek tiştên niha li Ewrûpayê peyde bûne mirov nikare di ser re derbas bibe. Ez behsa naverokê nakim. Pir tişt hene ku li Ewrûpayê hatine nivîsandin, lê naverok ne rast in.

Yanî bi kurtayî, ji bo pêşvebirina ramanên xwe, bi metodê em dikarin gelek feydeyê ji wan bigirin.

Baş e tu dibêjî ku we piranî ji aliyê metodên zanistî ve ji Ewrûpayê feyde girt, wan ji we çi girt? An jî we tiştek da wan?

– Ez karim heta cihekî bêjim, pir dostên Ewrûpayî ji aliyê pir beşan ve; beşên ramanî û beşên civakî ve vîtamînên xwe ji Rojhilat, ji Rojhilata Dûr digirin. Ji ber ku kurd jî, ji Rojhilatê ne, tesîreke kurdan jî, li ser Ewrûpayiyan çêdibe. Vê dawiyê jî, serhildana li welêt, li Ewrûpayê jî gelek proses derdbas kirin. Hinek dewletên Ewrûpayê her çiqas xebatên kurdan qedexe jî dikin, ew ji tirsê tê. Ew fedekariya ku kurd ji bo rizgariya xwe nîşan didin, dewletên Ewrûpayê ditirsîne, naxwazin civaka wan jê tesîrê bigire.

Tu dibêjî her çiqas dewlet ditirsin jî, civakên Ewrûpayî, ji şerê kurdan hînî fedekariya bilind dibe?

– Vê dawiyê, her çiqas hinek kes negatîf bibînin jî, kurdan xwe şewitandin. Vî tiştî li ser Ewrûpayiyan pir tesîr kir. Lê dewletên wan dîsa digotin: "Ev terorîst in!" Mixabin dema şerê Vîetnamê gelek rahîbên Vîetnamî xwe dişewitandin, herkesî ev pir mezin didîtin. Kirina rêxistinên kurd ji ya wan ne kêmtir e. Tonera şewata kurdan jî, ji wan ne kêmtir e. Lê

ŞÎRA TÊKOŞÎNA GELÊ KURD DIMÎNE:

'A MIROVAHIYÊ NAKIN'

ji ber ku rêxistin ne di bin kontrola wan de ye, li hember derdikevin.

Yanî kurd mezinatiya rihê mirovahiyê ji gorê derdixin ji bo wan?

– Mirovahî û pêşveçûn tenê ne teknîk û dîwarên betonê ne. Mirov kare bêje piştî têkçûna sosyalîzma reel, herkesî çêrî sosyalîstan, çêrî komunîstan kir. Li dijî mirovahiyê derketin. Xwestin îspat bikin ku çare tenê kapîtalîzm e. Li welatekî, tevgerek nemabû ku bîne bîra mirovan ku têkoşîn ji beton, ji teknîk û ji pereyan bilindtir e. Xebata rizgariya kurdan li Ewrûpayê ev tişt nîşan da. Kurdistan bû hêviyeke wekî Kuba û çend cihên biçûk.

Mesela mirov kare bersivê bide ka ji bo çi li bajarekî Ewrûpayê sed hezar mirov digihîjin hev û sloganan davêjin?

– Piraniya van sed hezaran jiyana xwe girtine bin garantiyê. Lê ew dibînin ji jiyana madî girîngtir tişt hene. Mirovahî heye. Azadî ne tenê ji bo şexsan. Ev dîtin dibe pêpaloka fedekariya ji bo mirovahiyê. Di vî warî de ez dikarim bêjim kurd hinek dersan didin alemê. Ev ders çawa tesîrê dike, însanên alemê vê fedekariyê çawa bi nav dikin, ev tiştekî din e, lê kurd, ev gelê bindest, vê dersê dide alemê.

Baş e em werin ser meseleyeke din. Hinek kes ji bo dema ku em tê de ne dibêjin ronesansa kurdî. Tu çawa li vê rewşê dinihêrî?

– Ez karim bêjim ev ji bo kurdan destpêka ronesansê ye. Lê ev sedsal, sedsala kurdan e. Ked û xebata wan wê piştî 2000'î berhema xwe bide.

Ev jî pisporî û avakirina saziyên civakî dixwaze...

– Gavên wisa hene. Vekirina Enstîtuyê, avakirina YRWK'ê, Parlamentoya Sirgûnê, hemû gavên wisa ne. Mirov kare bibêje gav bi gav, dilop bi dilop, ber bi sazûmaniye ve tê meşîn. Wekî her tiştî, di destpêkê de hinek êşên vî tiştî jî hene. Ber bi saziyên nû ve gav tên avêtin. Bingeh hatiye danîn, lê têrê nake.

Ev tecrûbeyeke dewletî jî, dide hereketa rizgariyê...

– Belê. Ev gavên ku tevgera rizgariyê, vê dawiyê avêtine, gelek li pêş in. Heta ev gav ji aliyê pir kesan ve bê fêmkirin, dem lazim e. Mesela avakirina 'enstîtuyê'. Tevger dixwaze vê saziyê bi destê kesên ku zanin enstîtu çi ye, bide meşandin. Lê em dibînin di pratîkê de hinek tengasî hene. Ji ber ku heta em fêm bikin enstîtu çi ye, demek dixwaze. Meseleya avakirina parlamentoyê jî wisa ye, heta ew mesele ji aliyê însanan ve bê fêmkirin, dîsa dem lazim e. Lê belê ev ber bi temambûnê ve diçe. Temambûna van saziyan ji xwe avakirina îktîdarê ye. Ev jî çûndina ber bi aliyê dewletê ve ye.

Rewşenbîrên kurd û saziya rexneyê çiqas nêzîkî hev in?

– Em hemû eynî tiştî bêjin, em nikarin rê vekin. Gerek e hin însan di mejiyê xwe de expermentan (ceribandin) çêkin. Di wênekêşiyê de wilo ye, di felsefeyê de, di xebata saziyan de wilo ye, di hemû beşên jiyanê de expermentî (ceribînî) û rexne pêwist in. Rexne ne tenê negatîf e. Mesela carinan ji rewşenbîran jî, rexneyên pir vala tên. Girîng e em metodên rexneyê jî zanibin. Vê dawiyê prosesekê rexnekirinê dest pê kiriye. Kurd hêdî hêdî mejiyê xwe vedikin. Berê tirs hebû, ez rexne bikim, wê çi bibe? Halbûkî raman bêyî rexneyê bi pêş ve naçe. Girîng e di mejî de teqîn çêbe.

Yanî rewşenbîrên kurd di nava xwe de kevneşopiyeke demokratîk ava dikin, ber bi wê riyê ve diçin...

– Ez tiştan zû nabêjim. Lê heta niha di nava kurdan de du tişt hebûn. Bi mantiqa Arîsto difikirîn; Reş û spî. Kurd jî wisa bûn. Ji te re bigotana "xerab" tu sed pare bûya jî, tu "xerab" bûyî, bigotana "baş", çiqas xerabiyên te jî hebûna, tu dîsa baş bûyî. Vê dawiyê ev hinek radibe, nirxandin xwe diguherîne.

Ez dixwazim li ser tîpên rewşenbîrên kurd pirsekê bikim. Bi dîtina min salên dawî, bi gelemperî rewşenbîrên kurd cilê xwe yê gundîtiyê avêtine. Yanî li Ewrûpayê û li metropolan tîpeke nûjen ez dibînim. Ev tîp hêdî hêdî xwe nêzî tevgera azadiyê jî dike. Tu vê dîtinê çawa dinirxînî?

– Bi me re şaşfêmkirinek heye, em dixwazin civak hemû bibe rewşenbîr. Di miletên din de jî, em dibînin rewşenbîr yek yek in. Pênc milyon rewşenbîr ranabin. Di civaka me de jî rewşenbîrên mezin hebûne û hene jî. Celadet Bedirxan yekî wisa ye. Mesela di civaka fransî de qala Cezayîrê bibe, du nav tên bîra mirov; Sartre û Fanon. Em dema ji Kurdistanê behs bikin; İsmail Beşikçi û Apê Mûsa tê bîra me. Kurdistan jî mîna miletên din rewşenbîrên wê hebûne, derketine, çêbûne. Lê miletekî mîna kurdan girîng e zêde rewşenbîran derxe, rewşenbîriyê bike sazî.

Di avakirina saziya rewşenbîrî de vatiniyên tevgera azadiyê gerek e çi be?

– Avakirina saziyan têrê nake. Yek; pêwist e, mirov fonksiyonên wan baş bizanibe. Dudu; ew kesên ku van fonksiyonan baş zanibe wan tesbît dike û tîne ser wir. Sisê; sazî girîng e bi gel ve girêdayî be. Ji bo rûniştandina saziyan ne tenê rewşenbîr, pêwist e civak jî, bê amadekirin. Rewşenbîr ne di fanosekî cam de dijîn, ew jî di nava gel de ne.

Enstîtuya Kurdî ya li Berlînê, xwedî dîrokeke çawa ye, kengê hat avakirin, çîroka wê, bi kurtayî tu karî bêjî?

– Fikra avakirina enstituyekê li Ewrûpayê ji avakirina Enstîtuya Stenbolê kevintir e. Em bi hev re dixebitin. Enstîtu berê jî, li Ewrûpayê hebûn. Lê me kafî nedît. Me got: "Divê saziyeke wisa ne tenê ji bo Ewrûpayê, lê rola wê ji bo Kurdistanê jî hebe." Ji ber ku enstîtuyên din rolên wan tenê li wan bajarên ku ava bûne heye. Bi fikra me, gerek e hemû kurd xwe karibin bigihîjînin wir. Di vî warî de fikra me heta 22'ê avrêla 1994'an hat û di vê mêjûyê de dest bi xebatê kir. Mêjûya avakirina wê û derketina rojnameya Kurdistanê eynî roj e. Em dixwazin bi xebatê naveroka vê tijî bikin. Ne ku tenê bê gotin: "Enstîtuyek heye".

Di vê pêvajoyê de we çi xebat kirin?

– Mesela li Holandeyê, li bajarê Maastrichtê me Konferansa Ziman û Çandê li dar xist. Ev ji bo pêşerojê bû karekî bingehîn. Sala 95'an sala Ehmedê Xanî û sala zimanê kurd hat îlankirin. Li ser gelek mijaran bernameyeke tijî li ber enstîtuyê heye. Lê karê enstîtuyê yê herî girîng û herî bingehîn, lêkolîn û karê zanistiyê li ser kurd û Kurdistanê û tijekirina dîplomasiyê, li ser karê çand û zanistiyê ye. Hedefên me ev in. Li Ewrûpayê û welatên Rojava zanîngeh girîng in. Mirovên girîng di zanîngehan de ne. Otorîte di van deran de ne. Xelk van otorîteyan didin berçav.

Em jî dixwazin vê rolê bileyizin. Mesela li welatê Kurdistanê şerek heye. Ev welat li ku derê ye, dîroka wî weletî çi ye, gelê wî kî ye? Girîng e em van tiştan diyar bikin û valahiya di vî warî de tijî bikin. Ev jî ne bi çîrokan, bi karê zanistî dibe. Û berî van karan jî, pir karên din ku di xizmeta gel de; ji kursan bigire, heta karên pratîk ên rojane, hene.

Karên îsal ku we dane pêşiya xwe, ji xwendevanên me re hûn karin diyar bikin?

– Belê, Em karin ji wan çend heban bêjin. Li Parîsê Sempozyûma Ehmedê Xanî, li Stockholmê Konferansa Edebiyata Kurdî. Konferansa Sînema û Şanoyê. Li Lozanê di 24'ê meha 7'an de Konferansa Dîrokê heye. Ku ev roj roja parçekirina welatê kurdan e, li vî bajarî. Dîsa di dawiya salê de Konferansa Çand û Hunera Kurdî. Di ber van konferansan de hin xebatên me dane pêş xwe jî hene. Yek ji wan avakirina muzeya şoreşê ye. Lê ev karekî dûr û dirêj e. Xebatên me yên li ser pirtûkan hene. Yek ji wan a Prof. Hesretyan e. Li ser fêrbûna zimanê kurdî pirtûkeke me derket, ew ji bo Ewrûpayiyan bû. Wekî din wê kovara lêkolînê derkeve. Li ber temabûnê ye. Hejmara pêşîn wê li ser ziman be.

HEVPEYVÎN: FAYSAL DAĞLI

Piraniya van sed hezar însanan jiyana xwe girtine bin garantiyê. Lê ew dibînin ji jiyana madî girîngtir tişt hene. Mirovahî heye. Azadî ne tenê ji bo şexsan. Ev dîtin dibe pêpaloka fedekariya ji bo mirovahiyê. Di vî warî de ez dikarim bêjim kurd hinek dersan didin alemê.

HÜSEYİN KARTAL KÎ YE?

Di sala 1958'an de li Elîhê hatiye dinê. Di dema zaroktiya xwe de çûye medreseyê.
Di xortaniya xwe de, fikrên neteweyî nas kirin û di sala 1980'an de berî hatina cûntayê derket Ewrûpayê. Bi gotina wî "Li Ewrûpayê salên pêşî rewşenbîrî û rêzanî bi hev re bir. Li Berlînê li ser Iranîstîkê xwend. Xeynî nivîsandina di kovar û rojnameyan de, bi navê A. Dikili, pirtûkên wekî; Kürt Sol Sosyetesi, Bekaa Bekaa (Bi Selim Ferat re) û Navên Kurdî nivîsandin.
Pirtûka wî ya almanî "Lêkerên Kurdî Hevdûdanîna Wan Berhev Bi Lêkerên Zimanê Îranî" jî, li ber çapê ye. Kartal endamê Îdareya Enstîtuya Kurdî ya li Berlînê û yê YRWK'ê ye. Li zanîngeh û mekteban dersên zimanê kurdî dide.

www.kurdi.org

DIK

'En büyük asker' li xestexanê ye!

Şerê ku li Kurdistanê diqewime, nijadperestên tirk dixe nava xofeke mezin, ji ber vê yekê li her derê tirsa xwe bi harbûnê didin der. Ev harbûn bi taybetî dema şandina leşkeran û rakirina cendekên leşkerên ku di şer de hatine kuştin, eşkere dibe. Divê bê gotin ku çapemeniya tirk vê harbûnê teşwîq dike. Heta zanyarên (!) wekî Toktamış Ateş di quncikên tarî yên termînalan de xwe veşartine ku li ser sewqa leşkeran analîzên zanistî bikin. Hinek caran dema sewqa leşkeran, komikên faşîst ewqas bicoş kesên ku wê biçin leşkeriyê ber bi asîmanan hildiavêjin ku mehmetcikên reben li serî li erdê dikevin û çavên xwe li nexweşxaneyan vedikin. Ji ber geremola ku wan gurên boz pêk dianî di dema sewqa leşkeran de êdî kes naxwaze biçe termînalê. Heta niha kesî li hemberî vê propagandaya faşîst dengê xwe nekiribû, lê bûyereke ku roja 7'ê adarê li termînala Gebzeya Kocaeliyê çêbû, dide zanîn ku êdî kurdên li metropolan û tirkên demokrat li hemberî vê heqaratê bêdeng namînin. Roja 7'ê mehê komek tirkperestên ku lêzimên xwe dişandin leşkeriyê, tevî hinek sloganên faşistî, digotin: "En büyük asker bizim asker" ango leşkerê mezintirîn leşkerê me ye. Li hemberî wan birek mirovên din sloganên antî-faşîst ku piştgiriya doza kurdan dikin avêtin. Li ser vê yekê di navbera herdu aliyan de şer derket, ji nijadperestan kesên bi navê; Selim Kılıç, Saim Kılıç, Akın Çelik, Dursun Bacalı birîndar bûn û niha li xestexaneyê ne.

SAMÎ BERBANG

Şer her diçe dijwar dibe. Di heftiya dawî de leşker li her derê li kemînên gerîlayan diqelibin

DI KEMÎNA GERÎLA DE 3 CEMSE ÎMHA BÛN

Şerê di navbera gerîlayên ARGK'ê û hêzên dewletê de li her herêmê gur bû. Operasyonên hêzên dewletê li hemberî gerîla negihîşt armanca xwe. Gerîla deverên di bin kontrola xwe de bernadin û şer li wan deveran germ dibe.

1.3.1995

Li navenda Êlihê, kesekî bi navê M.Salih Müjdeci ji aliyê kesên nenas ve hate kuştin. Müjdeci li der dora xwe wekî welatparêz dihate naskirin.

Hêzên dewletê avêtin ser gundê Helkisa Hezoyê. Piştî girtina ser gund, leşkeran gelek gundî xistin bin çav.

Li navenda Êlihê, operasyonên hêzên dewletê û binçavkirin didomin. Serokê HADEP'ê yê berê İlhan Çalar û gelek kesên din ji aliyê polîsan ve hatin binçavkirin.

Cerdevan û leşkeran avêtin ser gundên Dihê, Bizika û Dirişkayê. Ji sedema ku cerdevanî qebûl nekirine ev gund di bin pêkûtî û cerda hêzên dewletê de ne. Di vê êrîşê de cerdevan û leşkeran dest danîn ser gelek tiştên gundiyan.

Kesekî bi navê Zakir Bilicik ji aliyê leşkeran ve di riya Hezo de hate binçavkirin. Sebeba girtina wî leşkeran eşkere nekirin.

2.3.1995

Gerîlayên ARGK'ê li çola Pasûrê, êrîşî ser hêzên dewletê kirin. Di cerda gerîlayan de 7 cemseyên leşkeran tehrîp bûn. Li gorî çavkaniyên herêmê 28 leşker mirine, gelek leşker jî birîndar bûne.

Her diçe şerê di navbera gerîlayên ARGK'ê û hêzên dewletê germ dibe.

Operasyonên hêzên dewletê li navenda Êlihê didomin. Polîsên sivîl û tîmên taybet avêtin ser mala Yusuf Gün. Kurê wî Cafer Gün (15 salî) xistin bin çav.

3.3.1995

Li Bilîsê, li gundê Ünaldı, bi mayina gerîlayan Yüzbaşiyek bi navê Necdi Şentürk mir, 8 cerdevan birîndar bûn. Birînên cerdevanan xedar in.

Buroyên tirkan yên tûrîzmê li Almanyayê, li bajarê Badenwurttenbergê hatin molotofkirin. Tê gotin ku, ev livbazî ji bo protestoya zilma Komara Tirk ya li ser gelê kurd, pêk hatine.

Agir bi cebilxaneya Tugaya 3'yemîn ya Midyadê ket. Leşkerek mir, 2 leşker birîndar bûn. Di cebilxaneyê de gelek teqînên mezin çêbûn û cebilxane tehrîp bû. Der heqê sedema bûyerê de agahî bi destê me neketin.

4.3.1995

Hêzên dewletê bi ser gundê Hezoyê Mezra Halika ve girtin. Piştî girtina ser, li gund lêgerîn kirin û di dawiya lêgerînê de gundiyek binçav kirin.

Tîmên taybet û cerdevanan avêtin ser gundê Cimzerqa Misircê. Li gorî agahiyên ku me ji gundiyan standin, tîmên taybet li gund kesekî bi navê Tahsîn Özel girtin. Di gund de li wî û gelek gundiyên din îşkence kirin. Tahsin Özel ji ber lêdan û îşkenceyê xistin komayê, piştre ew binçav kirin.

5.3.1995

Cerdevanên gundê Çêlikê, li gundê Eynê helîkopterek xistin. Tê gotin ku, cerdevanan di lîstika şer de bêhemdê xwe helîkopter xistine. Albayek û 10 leşkerên di helîkopterê de mirin.

Hêzên dewletê li ser gundan cerd û pêkûtiyên xwe nasekinînin. Korika Qubînê ji ber ku cerdevaniyê qebûl nake ji bo valakirinê, di bin tehdîta leşker û cerdevanan de ye.

Leşkeran avêtin ser gundê Hergula Dihê. Piştî lêgerîna gund leşker ji gund derketin. Gundî nehatin binçavkirin.

6.3.1995

Gerîlayên ARGK'ê li çiyayê Bagokê, hêzên dewletê xistin kemînê. Di kemîna gerîlayan de 11 leşker û gerîlayek mirin, nêzîkî 40 leşker jî birîndar bûn.

Di navbera gerîlayên ARGK'ê û hêzên dewletê de li çola Gundê Xireba ya Mêrdînê şer derket. Di şer de 5 leşker mirin. Li Xana Hewêl cerdevan li mayînên gerîlayan qelibîn, 2 cerdevan mirin, yek jî bixedarî birîndar bû.

Di navbera Êlih û Sasonê de gerîlayan kemîn avêtin pêşiya leşkeran. Di kemîna gerîlayan de 3 cemse îmha bûn. Der heqê mirî û birîndaran de agahî neketin destên me.

Gerîlayên ARGK'ê li gundê Bazika Mêrdînê, cerdevanek revandin. Cerdevan Veysi Akgül (32) di dema pezçêrandinê de hatiye revandin.

Li navenda Êlihê êrîşî faîlî meçhûl nasekinin. Dîsa di êrîşên faîlî meçhûl de kesek hate kuştin, 2 kes birîndar bûn.

7.3.1995

Li ser riya Kaşurî konvoyeke leşkeran kete kemîna gerîlayan. Di kemînê de gerîlayan otobuseke tijî leşker bi roketan hate tehrîpkirin, otobus di zinêr wer bû. Di livbaziyê de 30 leşker mirin, gelek leşker birîndar bûn. Li Edeneyê 5 kes ji aliyê gerîlayên ARGK'ê ve hatin kuştin. Hate gotin ku wan kesan alîkariya dewletê kirine û bûne sebebê girtin û kuştina gelek welatparêzan.

Di navbera Sason û Pasûrê de gerîlayên ARGK'ê û hêzên dewletê şer kirin. Di şer de 46 leşker û 4 gerîla mirin û gerîlayek jî birîndar bû.

Li gundê Şêx Hemza ku girêdahiyê Pasûra Amedê ye, trektora cerdevanan li mayîna gerîla leqitî. Der heqê mirî û birîndaran de agahî bi dest neketin.

KURD-A/ Welatê Me

Li Edenê ARGK'ê 5 'muxbîr' kuştin

Li gorî agahiyên Kurd-A'yê li Edenê di hefteya dawî de 5 kes ji aliyê gerîlayên ARGK'ê ve ji ber karê ajantiyê hatin kuştin. 3 kes jî ji aliyê ERNK'ê ve tên pirsiyarkirin.

Li gorî agahiyên ku çavkaniyên herêmê hatine standin, van kesan beriya demekê di girtina 80 welatparêzî de alîkarî dane hêzên dewletê. Xeynî vê yekê li gorî agahiyên kesekî ku bi telefonê li me geriya û nexwast navê xwe bide, ji wan kesan Nebî Polat, Reşid Şimşek û Hüseyin Kurt li herêma Çukurovayê gelek kesên ku wekî welatparêz tên naskirin û endamên HADEP'ê ne kuştine. Wan ji vî karî ji dewletê 3 milyar pere standine. Ji havîna sala çûyî bi vir ve li Edeneyê Serokê HADEP'a Yüreğirê Rebih Çubuk, endamê HADEP'ê Sefer Cerf, endamên DEP'ê Mehmet Payan, Badin Oğuz, Yalçın Kılıç û delegeyên HADEP'ê Sait Macir û M. Sait Sebütekin bi destê kesên nenas hatine kuştin.

Kesên ku ji aliyê ARGK'ê ve hatine kuştin ev in; Nebî Polat, Reşit Şimşek (Êlih 31), Hüseyin Kurt (Midyad 28), Cevdet Bozotmak (Amed 18), navê kesekî jî bi dest neket. Dîsa li gorî agahiyên ku kesekî ji Edeneyê bi telefonê dan, rojnameya pirsiyariya 3 kesên din jî didome û piştî pirsiyariyê wê ew kes li 'Mehkemeya Gel' bên darizandin.

2 muxbîrên (Reşit Şimşek, Hüseyin Kurt) ku ji aliyê ERNK'ê ve hatine darizandin û bi destê milîtanên ARGK'ê hatine kuştin.

Kurd-A / Welatê Me

RAMANEK LI SER ÇARESERIYA GELEMŞEYÊN ZIMANÊ NETEWEYÎ

YEKÎTIYA ZARAVAYÊN KURDÎ PÊWIST E

Yekîtiya zimên li her welatekî bi awayekî cihêreng pêk hatiye. Du awayên pêkanîna yekîtiya zimên hene. Heta sedsala 20'an yekîtiya zimanan ne bi awayên zanistî, lê bi awayên serdestbûnê pêk hatine. Ji hêla ramyarî û artêşî ve kîjan êl bi hêztir bûye zaravayê wê bûye zimanê fermî û hemû mirovên din mecbûr mane ku wî zaravayî hîn bibin. Yên ku zaravayê êla serdest an jî zimanê gelê serdest ê dagirker nizanibûna ji jiyana bazirganî, çandî, artêşî û hwd. bêpar diman. Împaratoriya Romayê ya koledar bi vî awayî zimanê xwe bi Ewrûpayê daye pejirandin.

Tesîra zaravayên serdest

Zimanê neteweyî yê Fransayê "le français" zaravayê Francan e. Dema Francan serdestiya ramyarî û artêşî xistin destê xwe, zaravayê xwe jî, ji her aliyî ve di ser zaravayên din re girtin. Roj bi roj zaravayê Francan xurtir bû. Zaravayên din jî ketin domana çûyîna ber bi mirinê ve. Piraniya van zaravayan îro bi temamî hatine jibîrkirin.

Zimanê hempar ji zaravayekî

Li Îtalyayê hema hema li her herêmekê zaravayek wekî zimanê fermî hatiye pejirandin. Zimanê hempar ji zaravayekî pêk hatiye. "... Li Îtalyayê ji ber giranbuhatiya hêjabûna edebiyata Toscana zaravayê Floransa bûye zimanê hempar." (1) Di domana dîrokê de ji van zaravayan hinek ewqas ji îtalyanî dûr ketine ku gihîştine dereceya zimanekî serbixwe. Ji gelê îtalyan, yên ku zaravayê wan zêdetir ji îtalyanî dûr ketine, îro daweya ji Îtalyayê veqetîn dikin. Ev ne awayekî çareseriya pirsgirêka zimên e; di halê xwe de, beredayî hiştina zaravayan e.

Medoda Zanistî

Li Norwecê bi awayekî zanistîtir û hemdemtir yekîtiya zimên hatiye pêkanîn. "Di vê mijarê de rêxistina ku senteza zaravayên rojavayî risteke bingehîn lîst û bi vî awayî rê li ber zimanekî (lansmal "zimanê welêt") aîdî hemû Norwecê (piştî 1853'an) vekir; îro bi navê nynorsk (Norweciya Nû) bi bokmal re wekî sê zimanên fermî tên pejirandin." (2) Zimanê bokmal ji senteza zimanê danî û norwecî hatiye derxistin.

Mamoste Hêjar (Evdirehman Şerefkendî)

Li ser kurdiyeke neteweyî heta niha nehindik nihêrîn û dîtin hatine holê. Rewşenbîrên kurmancan bi awayekî eşkere nebe jî, tim serdestiya zaravayê kurmancî xwestine. Bi çavê zaravayê lişûndemayî, li zaravayên din nihêrîne. Helwesta xelet a rewşenbîrên kurmanc li ser kesên ku bi zaraveyên soranî diaxivin jî tesîreke neyînî hişt. Îro hîna piraniya rewşenbîrên soran xwe nêzîkî alfabeya latînî ya kurdî nakin. Bi awayekî eşkere nebêjin jî, vê alfabeyê wekî alfabeya kurmancî dibînin. Tirsek wan heye: "Heke em alfabeya latînî bipejirînin, em dê serdestiya soranî ji kurmanciyê re bihêlin."

Berhemên zaravayê kirdkî (zazakî) kêm in

Zaravayê zaza ji hêla nivîsî ve pir li paş maye. Rewşenbîrên zaza heta niha serdestiya zaravayê xwe li ser zaravayên din îdîa nekirine. Lê ji van hinek, dîsa ji ber helwesta xelet a piraniya rewşenbîrên kurmanc, li cem kontrgerîla cih girtine û bi wan re êrîşî gelê xwe kirine. "Rewşenbîrên" zaza yên li der dora kovarên wekî Ayre, Piya û hwd. bi vî awayî xwe spartin ramyariya dewleta dagirker û bûn berdevkên daxwaziya kontrayan. Lê piraniya rewşenbîrên zaza ev bi destê xwe teşhîr kirin û nebûn hemparên hevkariya wan. Rewşenbîrên zaza heta niha ji bo pêşvebirina zaravayê xwe xebitîne û dixebitin.

Zaravayên goranî û lorî

Rewşenbîrên me yên bi zaravayên goranî û lorî qise dikin, bi piranî, niha bi soranî dinivîsin. Bi van zaravayên me ne hindik berhemên edebî û olî hatine nivîsandin. Baba Tahirê Hemedanî helbestên xwe yên giranbuha bi zaravayê lorî nivîsandine. Li gor Gîv Mukriyanî berhema kurdî ya herî kevin bi zaravayê lorî hatiye nivîsandin. Heke em Avestayê nehesibînin kitêba "Dînkerd" berhema pêşîn a zimanê nivîskî ya kurdî ye. Ev kitêb bi lorî hatiye nivîsandin. Kitêbên pîroz ên gelê me yên li ser ola Versa (Ehl–î Hak) bi zaravayê goranî hatine nivîsandin. Îro hîna jî nivîsên vê olê bi goranî tên nivîsandin.

Mamoste Hejar û yekîtiya zaravayan

Beşek rewşenbîr, zimanzan û sazgehên kurd, di civandin û bikaranîna hemû peyvên hemû zaravayên kurdî de hemraman in. Ferhenga Kurdî–Farisî ya Mamoste Hêjar di vî warî de gaveke pratîk a girîng e. Mamoste Hêjar heta ji destê wî hatiye peyvên hemû zaravayên kurdî di vê berhema xwe ya giranbuha de li hev civandine. Ji ber ku li Başûr zaravayê zazakî nayê axaftin û di salên ku ferheng hatiye amadekirin de weşanên bi vî zaravayî hatibûn weşandin hema hema qet tune bûn, peyvên zazakî di ferhengê de kêm cih digirin.

Di vekirina Enstîtuya Kurdî ya Berlînê de li ser zimanê neteweyî wiha tê gotin: "... Di domanê de bi giranîdayîna ser kurmancî, lê ji senteza hemû zaravayan û bi rastirdîtina bikaranîna alfabeya latînî, afirandina zimanekî neteweyî, ramanên hempar bûn." (3)

Dîtinên Xelîl Xeyalî

Nivîskarê rojnameya Medya Güneşi Felat Dilgeş di nivîseke xwe ya li ser Xelîl Xeyalî nivîsiye de, armancek ji armancên wî yên girîng wiha dide diyarkirin: "Xelîl Xeyalî di bin navê "Qomîteya ziman" de li ser pirsa avakirina sazgeheke ku li ser pirsên ziman dixebite û endamên wê di mijara ziman de pispor in, disekine. Karekî komîteyê yê herî girîng jî ev e: Civandin û qeydkirina peyvên ziman. Her peyvên ku tên qeydkirin, divê li hemberî wan di zaravayên din de çi tê gotin, bê nivîsîn." (4)

ROJHAT AZADÎ

REWEZ

Welatî azad

(Soranî)

Ke çawî kaniyekman kwêr deken, deyan kanî çaw sewiz û şîn, çaw heldênin.. Ke dirextêkman ser debrin, be xwênî le ber roştûy ew, deyan direxitman bala deken. Ke ejnoy koşkêkman deşkênin, deyan koşkî pir hîwaman, beriztir, xoşiktir, le bartir radebin.

Îdi ew roja roy, awazî geruman bixinkênin, awazî geruman ew sirwe nasikey tenge derbendêk niye, be êwe le go naxrêt. Îdi kaniyekanî evînman, kaniyekani bûn û jinman, ew rûbare be xûr û ew deryaçe pir gûl û naneyan xemlanduwe, ke be êwe wişk û ziwa nakrêt.

Ew roje roy, kazîwe be xwên im sûr ken û engoreş be hewalî serbirîn im tarîh ken. Ew roje roy, ke çawî çep im kwêr ken û rastîş im, zeq zeq têy birwanê. Destêk im bişkênin, ewî tir, le bertan bilerzê. Henaw im dax ken û giynîş im, kirnûştan bo bênê. Ew roje roy.. Wekû dwênê, wekû dîrokî fire dûr, le sûrayî xor nişîn da bû be qeqnes.

Êsta xwên im buwe be merekebî dile pênûsî işqî azadî zêd û lanekem. Çaw im, buwe be keskayî jiyanî mêrg û bêşelanekem. Dest im, buwe be gul helgirî kejawey nêrgizecarî nîştimanekem. Laq im, buwe be rêbwarî hengaw nerî ber be çiya û kosarekem. Henaw û giyanîş im, buwe be amêz û koşî welate azadekem.

Bese îdi, le rojgarî kar û barî na lebartan da, tirûske û çirûsketan nehêşit. Bese îdi, pepû asa, be ser war û jiyar (jiyan) xelk da meqîrenin û nûqlaney nacor lêmeden, em careyan be hîç berbestêk natwanin hengawekanî ew zerya ye bimeyenin, em careyan natwanin, na. Hajey be rûbarî be xûrî em careman, bo ême semfonyay evînêkî dil firên e û kêlgey derûnman dexate kerwêşke, bo êweş ew denge be sam û tiris ahenge ye, ke gwêtan ker dekat.

Emro detwanin le rojevî şûmî xeyal pilawîtan da, derwazey welatî azad elqe rêz biken û qiflêkî jeng girtûy naw embarekanî mêşiktanî be diyarî bo binêrin, lê sibey le gel zerdexeney gûlêkî beharî da, welatî azadîş, be kincêkî cwantir, be xendeyekî xoşiktir û be pêngavêkî le bartirewe wek çon gûl û giya sewnim le amêz deken, awaş le haweşî azadî da şite cwanekan des le milanêy yek dî debinewe.

Ew girdolkaneman cêhêşit ke serî lûtkeyan lê we diyar nebû. Îdî kemerî xemekanman hawqas pan û por bû, bal bigrêt û berew lûtkey tac le serî hewran le şeqqey bal bidat. Îdî hîç şitêkman lê penhan niye, hîç şitêk le lûtke naya veşartin.

Xem bê yan şadî, şîn bê yan şahî, ême bûxçey mebestman birdote lûtke û lûtkeman kirdote cêjwan, rastî ême le hemwanewe diyar û rastî hemwanîş le êmewe diyar e. Îdî eger xo nexapênin bo mêjû çend çirkeyeke û reng bê le çirkey sibey yan duwey lew cêjwane bilinde da, lew lûtkey welatî azade da, agirî newrozman beriztir, girî beriz bêtewe.

Ew wexte pişkokan çawî şemşemekwêran kwêr deken, bo zor kesanîş, sirûd û sitranî be agir nûsraw û tomar kiraw debêt, ew sirûd û sitraney ke bawe gewrey dirûdman Zerdeştî bawikî bawan, notekanî nûsîwetewe.

SÎRWAN REHÎM

Tevgera Azadiya Jinên Kurd:

Jina kurd êdî azadiyê ji xwe re dike qeder

Tevgera Azadiya Jinên Kurd (TAJK) Roja Jinên Kedkar yên Cîhanê bi çalakiyên cur bi cur pîroz kir. TAJK'ê bi mebesta pîrozkirina vê rojê belavokek diyar kir. Di belavokê de tê gotin ku li ser rûyê erdê hêzên împeryalîst û kolonyalîst bi riyên cur bi cur jin kirine kole. Dîsa tê gotin ku li Kurdistanê bi saya tevgera azadiyê jina kurd bi keda xwe li nik mêrê kurd cih digire û di hemû qadên jiyanê de azadiyê bi dest dixe. Belavok dide zanîn ku jinên kurd di nava refên gerîla de artêşa xwe ava kirine. Belavoka TAJK'ê wiha dewam dike: "Ev jina ku di nava şerê azadiyê de kesanetiya xwe dibîne, qeyd û bendên ku kedxwaran pê dest û piyên wê girêdane yek bi yek diqetîne, êdî ew azadiyê ji xwe re dike qeder. Ev jin, alternatîfa jina ku împeryalîst û kedxwaran deriyê malê di ser re nifte kirine, bi zilaman ve girêdane û ew kirine xemla nava malê. Belavok helwesta du keçên kurd; Bêrîvan û Ronahiya ku Newroza sala çûyî xwe şewitandibûn, wekî rênîşandarên 8'ê adarê bi nav dike. Di dawiya belavokê de tê gotin ku jinên di nava tevgera rizgariya Kurdistanê de ji jinên cîhanê re bûne mînak û divê jinên cîhanê ji tecrûbeyên wan îstîfade bikin.

Tevgera Azadiya Jinên Kurd li gelek bajarên Ewrûpayê Roja Jinên Kedkar pîroz kir.

Li Berlînê roja 8'ê adarê 150 jinên kurd li Mala Kurdan pîrozbahiyek li dar xist. Beşdaran dan zanîn ku bîrûbawerîyên jinên mîna Klara Zetkin û Rosa Luksemburgê hê jî riya jinan ronî dikin. Pişt re wan bal kişand ser fedekariya jinên di nav refên şerê rizgariya gelê kurd de. Hate gotin ku ev şer di hemû qadên jiyanê de jineke azad pêk tîne.

Dîsa eynî rojê li Darmstadta eyaleta Hessen'ê 100 jinên ji neteweyên cur bi cur roja jinan pîroz kirin. Nûnera TAJK'ê di pîrozbahiyê de bi kurdî, tirkî û almanî axaftinek kir. Berdevka jinên endamên DGB'ê (Yekîtiya Sendîkayên Almanyayê) Marika Tesar got ku ji bo vê rojê jin deyndarê Klara Zetkinê ne, ji ber ku wê bi keda xwe ev biryar bi Înternasyonala Duyemîn daye qebûlkirin. Bi eynî mebestê li Frankfurtê jî pîrozbahiyek çêbû.

Berlîn/Welatê Me

Jinên Hêşînparêz îsal balê kişandin ser rewşa jina kurd

Leyla Zana bû 'Jina Salê'

Leyla Zana ji aliyê koma "jinên Hêşînparêz" ve wekî "Jina Salê" hat îlankirin. Komek jinên Hêşînparêz li devê deriyê Girtîgeha Enqereyê, civîneke çapemeniyê çêkirin. Jinên Hêşînparêz di civînê de daxuyandin ku: "Bêyî ku ji hilbijêrên wê bê pirsîn, parlamenteriya Leyla Zanayê jê hatiye standin. Û ji ber ku azadiya fikran diparêze jî hatiye girtin û ketiye zindanê." Piştî civîna çapemeniyê Serokê Partiya Hêşîn-parêzan ya berê Bilge Cantepe û hevalên wê xwestin ku Leyla Zanayê di girtîgehê de ziyaret bikin û şitla ku bi xwe re anîne û navê "Dara Azadiyê" lê danîne, bidine wê. Lê rêvebirên girtîgehê destûr nedan wan.

Navenda Nûçeyan

Roja Jinên Kedkar li HADEP'a Bahçelievlerê hate pîrozkirin

'Gerîlabûna jinan gaveke girîng e'

Di roja 7'ê adarê de li HADEP'a Bahçelievlerê ji bo Roja Jinên Kedkar civînek hate lidarxistin. Jinên ku di civînê de axivîn pêşî li ser dîroka Roja Jinên Kedker ên Cîhanê ku hersal di 8'ê adarê de tê pîrozkirin, rawestîn. Pişt re jî bal kişandin ser jinên ku îro bûne gerîla û ev di warê bipêşketina jinên kurd de wekî gaveke girîng bi nav kirin.

Di civînê de li ser navê Navenda Çanda Mezopotamyayê Nuray Şen, li ser navê Kovara Özgür Halk'ê Emine Mısır, li ser navê navenda HADEP'ê Komîsyona Jinan Cemîle Gündoğan, li ser navê Zanîngeha Stenbolê Songül Çekik û li ser navê jinên kedkar Zübeyde Şar beşdar bûn. Wan bi axaftinên cihêreng bala guhdaran kişandin ser xwe. Nêzî 100 kesî ji bo vê pîrozbahiyê li navenda HADEP'ê ya navçeya Bahçelievlerê gihîştibûn hev.

Berî ku axaftin dest pê bikin, beşdarvan li kaseteke vîdeoyê ku ji bo mafên jina hatibû amadekirin, temaşe kirin. Civîn piştî axaftinan bi stranên dengbêj Yakup Turgut qediya.

Navenda Nûçeyan

Jinên temaşevan jî di civînê de dîtinên xwe anîn zimên

PIRTÛKA ÎNKARKIRINA KURDÎ

KÊ ZIMANÊ KÊ DIZIYE?

Prof. Dr. Tuncer Gülensoy gotinên kurdî dinivise û dibêje ku koka wan gotinan ji Tirkî tê. Gotinên ku bi Kurdî nivisandine %80 şaş nivisîne. Di her gotina Kurdî de du-sê tîp guhertine ew nêzîkî yên Tirkî kirine û koka wan bi zimanê Tirkî ve girêdaye.

Di van rojan de pirtûkek bi navê "Kürtçenin Etimolojik Sözlüğü" ji aliyê Prof. Dr. Tuncer Gülensoy ve hatiye weşandin. Li ser pirtûkê Ankara, 1994, Türk Tarih Kurumu hatiye nivîsîn. Daxwaza pirtûkê tunekirina zimanê kurdî ye, bi gotineke din înkarkirina wî ye.

Girîng e ku mirov li ser wê bisekine. Ji ber ku ev pirtûk ji gelek kesan re bêpere hatiye şandin û di serê gelekan de bûye sebebê pirsan.

Ev pirtûk înkariya zimanê kurdî diyar nake, tunebûna xwe, tengasiya xwe dide xuyakirin. Lê em hîn di vê demê de jî van sîleh û hacetên wan ên kevin dibînin. Di vir de em careke din dibînin ku zimanê me pareke girîng e di hebûna netewe-ya me de. Lewma ji her tiştî bêhtir ji zimanê me ditirse.

Prof. Dr. Tuncer Gülensoy gotinên kurdî dinivise û dibêje ku koka wan gotinan ji tirkî tê. Gotinên ku bi Kurdî nivisandine %80 şaş nivisîne. Di her gotina Kurdî de du-sê tîp guhertine ew nêzîkî yên Tirkî kirine û koka wan bi zimanê Tirkî ve girêdaye. Em li ser, di pirtûkê de çiqas peyvên tirkî hene, nasekinin. Ji ber ku min ew nedîtin. Bi piranî peyvên kurdî, erebî, farisî û yên biyan in. Ger em van gotinan ji pirtûkê û ji ferhenga tirkî derxînin binivisînin pelên rojnameyên qet têrê nakin. Heke Gülensoy gotinên biyanî bi kar neyne nikare nameyekê jî bi tirkî binivîse. Silavekê jî bi tirkî bide.

Di bêjeyên kurdî de nêr û mêtî hene, lê di zimanê tirkî de ev yek nîn e. Bingeha ji hev cihêbûna zimanê kurdî û tirkî ji vir tê. Kurdî ji koma zimanên ÎndoEwrupî, beşa Îndo Îranî ye. Di nava zimanên Îranî de Kurdî yek ji wan î herî girîng e.

Em hemû gotinên Kurdî ji zimanê Tirkî dernaxin, hinek jê derdixin û li jêrê dinivîsin. Ji aliyê din ve jî Prof. Dr. Tuncer Gülensoy vexwendî îspatkirina bi tirkîbûn van peyvan dikin:

Aheng, ahengdar,amade, ari, aşikar, avaz (awaz) bağ , bazar, bezirgan (bazirgan), beher, bend, menekşe (binevş), beraber, berhava, beste, bestekar, bahçe, bahçevan, bahşiş, baht, bedbaht, bahtiyar, beyhude, bekar, para, biperva, bülbül, bülent, bostan, bira, birader, pişman, cömert, civan, can, canhiraç, ciger, canavar, cenk, çalak, çerçeve, çare, çarşamba, çeyrek, çark, çira, çit, çimen, tane, dar, derbeder, derbent, dergah, derman, derya, terzi, destur, testi, deste, durbin, düşman, dilaver, dilovan, dilber, dost, dürüst, duman, eğer, anbar, encam, endam, endişe, ferman, kem, fişek, gerdan, girdap, gırift, köşe, gül, hafta, hemen, hemşehri, hemşire, her, herkes, ibrişim, huner, kar, karvan, kepçe, kağit, kerpiç, kenar, kör, lal, leş, mader, meyer, mayhoş, hoş, meze, mert, mıh, naçar, nalan, nermin, name, nankor, ney, neyzen, naz, nazik, narh, asayiş, rayiş, nevroz, nergız, nigar, yad, şad, yadigar, nişan, nişangah, pak, padişah, şah, pencere, peynir, parça, hali, perde, pis, şan, piyade, suvarı, perşembe, peşkeş, keşmekeş, pul, piyaz, puşu, put, putperest, rençber, mezra, maraba, ırgat, renk, ruşen, ruken, ajda, mujgan, arzu, asuman, şaduman, rehber, gulçin, saz, servi, sermaye, sermayedar, mest, sarhoş, sermest, serbest, serkeş, sergede, serseri, serzeniş, sahtiyan, post,postnişin, piyasa, şirin, sütün,destek, taze, viran, hançer, terazi.....

Hêjayî gotinê ye, divê ez bibêjim ku min bi awayekî rêkûpêk ev peyv nebijartin û li dû hev rêz nekirin. Hema çi hatin ber devê min, min ew raxistin ser kaxezê.

AHMET BARAÇKILIÇ

Berga, pirtûka Gülensoy ya bi navê "Türk ve Kürt Deyim ve Atasözleri"

HOMEROS Û ÇÎROKEKE KURDÎ

Du heb pirtûkên hozan Homeros* bi tirkî hatine weşandin: "İlyada" û "Odysseia". Herdu jî destanên xwerû ne. Di destana "Odysseia" de efsaneyekê bala min kişand. Min ev çîrok di biçûktiya xwe de bihîstibû.

Di pirtûka "Odysseia" de di beşa nehan de qehreman Odyseeus serpêhatiya xwe ya li qirangê Trakya yê tîne ziman. Li wê qirangê de şikefteke dêwê yek çav heye.

Odysseus dêw meraq dike û tevî hevalên xwe diçe şikeftê. Dew êvarê pez dike şikeftê û bi lotek mezin dergeh dide cih. Odysseus û hevalên xwe bêçar dibînin. Dew her roj du heban ji wan dixwe. Talî Odysseus şeratê dide dêw, bi martagek tûj çavê dêw kor dike. Dew sibehê latê radike û xwe dide ber derî. Odysseus beranan sê heb sê heb bi hev ve girê dide; hevalek xwe li beranê navberê siwar dike, herdu yê din di kêleke re dimeşin, Odysseus jî xwe di binê beranekî de girê dide û bi wî awayî xwe xelas dikin.

Çîroka ku min li gundekî Gimgimê li înaqa guhdar kiribû jî hema hema wekî serpêhatiya Odysseus bû. Em hinekî bidin diyarkirin: Şivanekî mêşinek xwe winda dike û lê digere. Li warekî dibe êvar. Şivan xwe diavêje şikeftekê û serî li xewa şîrîn datîne. Êvarê dêwê yek çav tevî pez dikeve hundir. Bi latekî derî dixitimîne. Şivan bixwe ve tê xof û tirseke mezin wî digire. Dew agir dadide, goştê sor dixwe dibe pixîna wî û radizê. Şivan şîşekê sor dike û çavê dêw dikizirîne.

Sibehê dew her lingekî xwe dide aliyekî derî, kîjan mêşin derbas dibe dest li piştê dide. Lê badilhewa! Dêw xwe nagihîne armanca xwe. Lewre şivan bi şev miha qer şerjê dike, postê wê li xwe dike. Dema derbas dibe dêw bang dike: "Ho ho miha qer, pez îro ma li hêviya te!" Şivan jî zarî mihê dike û derbas dibe.

Rast e, pir çîrokan di nava neteweyan de şirîk in. Dîsa jî mirov dikare bipirse: "Gelo ev têkilî çawa pêk hatiye?" Tiştekî balkêş e.

Odysseus bi martag (ço yê qalind) şivan bi şîşê çavê dêw kor dike! Em bi hêsanî dikarin bibêjin ev efsane ji demeke pir kevin hatiye.

* Helbestvanê epîk yên Yewnana kevnare. Ew wekî helbestvanê herî kevin yê wêjeya Ewrûpayê jî tê binavkirin. Li gorî dîrokzanan ew di sedsala 8'an (B.Z.) de jiyaye.

JÊHAT GIMGIM

DEFTER

Newroz a kê ye?

OSMAN ÖZÇELİK

Di jiyana her mirovî de rojên ku nayên jibîrkirin hene. Ji van hinek, rojên xerab in. Hinek jî biqedr û qîmet in. Wekî roja hatina dinyayê, roja nefîbûnê, roja dîlketinê,..

Ev roj, rojên şexsî ne, ew ji bo hin kesan girîng in.

Bûyer hene ku ne kesek bi tenê, gelek kes di bandora wê de dimînin. Mirina dê û bavan an ji mirina hevalekî çê, tesîrê li gelek kesan dike.

Bûyer çiqas mezin be, kesên di bandora wê de dimînin zêdetir dibin. Mezinbûna bûyerê di hiş û bîra mirovan de, di bîra civatê de cih digire, dibe dîrok.

Bûyer gelek caran bi navê rojekê, bi navê salekê an jî bi navê kesekê/î, bi bîr tê. Rojên şahiyê û rojên şînê hene.

Hinek roj jî hene ku ne li ser bûyerekê, bêlê ji pêwistiyekê, ji daxwaz û hêviyekê hatine pê. Ew balê dikişînin ser çewtiyekê an jî daxwaza rabûna xerabiyekê nîşan didin. Wekî roja dayikan, roja jinan, roja zarokan. Wekî sala aştiyê, sala xweşdîtinê, sala Ehmedê Xanî, carinan sedsal jî bi nav dibin. Wekî navê sedsala 21'an ji îro ve bûye "Sedsala Mafên Mirovan."

Roj, sal an jî sedsal di naveroka xwe de çiqas aştiyê dihewîne û çiqas pêşiya mirovatiyê rohnî dike, ewqas dibe navneteweyî û ewqasî jî dibe malê mirovatiyê.

Bûyereke bûyî ne tenê gelek, yên din jî di bandorê de dimînin. Dibe ku bûyerek ji gelekî re bixêr, ji yên din re nebixêr an jî ne girîng be.

Em bibêjin koçkirina Hz. Mihemed ji misilmanan re rojeke girîng e. Belê ji bûdîstan re ne ewqas. Kuştina filehan ji kurdan re girîng e, belê ji ermenan re girîngtir e. Derketina tirkan ji Asya Navîn, ji tirkan re rojeke bixêr e. Lê ji kurdan re ma wisa ye?

Bûyerê jiyana kîjan civatê ji binî ve hejandibe, ew civat xwedîtiyê lê dike. Bûyer ji nifşan derbasî nifşan dibe, ji qirnekê derbasî qirnekê din dibe.

Bi hezaran sal kurd, roja Newrozê wekî cejnekê pîroz dikin. Newroz ji kurdan re bûye sersal. Newroz serîhildan e, jiyaneke serfiraz e, Newroz aştî û evîn e... Li ser newrozê dûrik (kilam) hatine gotin, helbestên ku li ser newrozê hatine nivîsîn heke bêne civandin wê bi hezaran rûpel tijî bikin. Her kurdek ku dest bi lêxistina saz dike, dûrikekê (kilam) jî li ser Newrozê dibêje. Her şairekî kurd wexta dest bi nivîsê dike, helbestekê li ser Newrozê dinivîse. Jiyana kurdan û newroz bi hev re bûne yek parçe.

Komara Tirkiyeyê, ev heftê sal bûn Newroz ji kurdan re qedexe kiribû. Di newrozê de bi sedan kes hatine kuştin. Îro rabûne dibêjin: "Newroz roja tirkan e, emê wê bikin rojeke fermî."

Ma ji ku Newroz bûye cejna we. Di jiyana we ya civakî de tu şopên Newrozê hene? We çend dûrik, çend stran û şop li ser Newrozê nivîsîne. We ji "Bê di kadînê de çi anîne serê Emînê" heta "Şiqidim şiqidim!" bi hezaran stran gotine. We yek rêzik li ser Newrozê negotiye. Ma ji ku Newroz cejna we ye!

We zimanê me, dûrik û stranên me, dans û lîstikên me ji me standin. Ma qey êdî dor hatiye ser cejna me?

www.arsivkurd.org

XALXALOK Û SÎSIRK

Ku bihar tê erd germ dibe
Bi baranê ax nerm dibe

Kêz û kurmik tev têne dar
Nav çîmenan dibe tevger

Mûriyê li mûrîstanan
Çivîkên li daristanan

Bi dilşahî bextewarî
Xebat dikin bi hawarî

Mûrî dexlê dikişînin
Çivîk hêlînan pêk tînin

Kêzik û sîsirk bi zîr zîr
Çûk û çivîk bi çîrewîr

Guh li mirovan ker dikin
Lê kulan ji dil derdikin

Li deşteke Kurdistanê
Li hêla Deşta Rewanê

Li mêrgeke tije giya
Xalxalokek digeriya

Nazelîn û gelek xweşik
Rengesor bi deqên reşik

Hêdî hêdî bi giranî
Li ser simbilan datanî

Ji simbilan şîr dimerast
Bi bêdengî xwe diparast

Têr xwar û li xwe ponijî
Germê dayê xweş hînijî

Li jêr mûrî, kulî û maşot
Li jor mozên mîna sersot

Hin li hawîr digeriyan
Hinek di ser re difiriyan

Lê xalxalok dengan nake
Qet xewa xwe xera nake

Lê ew xewa wê ya şîrîn
Bi dengekî hate birîn

Hilçenî û veciniqî
Ji hêrsa xwe vexeniqî

Çav li xew û bi serê gêj
Nêrî ku sîsirka pirbêj

Li ser simbilek genim e
Bi zîr zîr û bi him him e

Xalxalokê got: "Bes gidî
Tu halo bêşerm û fedî

Çi zîr zîr û him û gum e
Te ez ji xew rakirime."

Sîsirkê got: "Xweş bihar e
Wek pizot im dil çi har e

Bi stran û bi dîlokan
Bikêf û henek û biken

Bihara xwe diborînim
Lewma halo har û dîn im."

Xalxalokê got: "Meyze ke
Êdî dûr e loma neke

Ji dirêjiya zarê te
Wê belayek bê serê te."

Sîsirk kenî got: "Ha ha ha!
Dengê min pir xweş e wiha

Ji ber dengê te nexweş e
Zikê te ewqasî reş e."

Xalxalokê peyv qut kir
Sîsirk bûye wekî agir

Kurm û kêzik, mêş û mûrî
Tev ji wir çûn ji mecbûrî

Li wî dengê sîsirka har
Ji kunê derket şeqemar

Got: "Ev nizanê ez kî me
Û ez gelekî birçî me

Halo bi zîr zîr û lew lew
Wê ez rakirime ji xew."

Haya sîsirkê jê nîn e
Bicar bar û biqêrîn e

Şeqemar bi radorî ket
Bi xasûkî li ber veket

Hêdî hêdî ber pê meş kir
Bo bigirê kemşer xweş kir

Xwe darayê mîna tîrê
Êdî tiştek nehat bîrê

Serî li sîsirkê gerand
Kire pariyek û qurpand

Xalxalokê ji ser simbil
Serî hejand kenî ji dil

Got: "Xwezîka te bizaniya
Ziman daqoqê serî ye."

JÎR DILOVAN

N A M E Y Ê N X W E N D E V A N A N

Çend gotin ji kurdên li metropolan re

Em kurdên ku ji ber zilm û zora dewletê ji welatê xwe derketine û li metropolan dijîn, me tevan xwe daye quncikê xwe û em dibêjin: "Marê ku bi me venede bila sed salî bijî." Lê em ji bîr dikin ku mar bi me vedaye.

Gotina min ew e ku hefteyê carekî rojnameyeke bi kurdî dertê; "Welatê Me", em lê xwedî dernakevin. Tu ji kê re bibêjî: "Çima rojnameyê nastînî?" Dibêje: "Nizanim bixwînim, jê fêm nakim." Em jê fêm bikin, jê fêm nekin jî gerek e em her hefte rojnameyê bistînin û ji bo xwendinê serê xwe biêşînin. Ev wezîfeyeke welatparêziyê ye.

Em tenê **'Çölajanî Emin'** bidin ber çavên xwe, di her nivîsa xwe de dibêje: "Rojnameyeke wan heye, ew rojname heftiyê 3–4 hezar difiroşe." Ez jî dibêjim: Êdî bes e, kurdên li Stenbolê, yê li Enqerê, yên li Îzmîrê, yên li Edeneyê wisa bikin ku bila rojnameya me ne 3–4 hezar, bila bêhejmar were firotin. Em kulma xwe li çavê yê wekî Çölajanî bidin.

Di karê xwe de her dem serfiraz bin. Silavên şoreşgerî û germ li we bin.

Evdilê Tewfiq/ Stenbol

Neyarên bav û kalan, nabin dostên lawan

Di dîroka kurd û Kurdistanê de gelek bûyer çêbûne. Di van bûyeran de gelek axa, şêx û begên kurdan hatine qetilkirin û daleqandin. Yek ji van Şêx Seîd, yek Seyîd Riza û yek jî bapîrê Kamran İnan e.

Ez dixwazim ku li ser bûyera bapîrê Kamuran İnan bisekinim. Ropo ew qetil kir û nehişt ku di gorê de jî bimîne. Dewleta ku bav û kalên mirovan bikuje û nehêle di bin axa sar de jî bimîne û bibe neyarê miriyan mirov rabe faşîst û şovenên wê dewleta xwînxwar û kedxwar biparêze. Ji vê şaşîtiyê, xayîntî û koletiyê mezintir tiştek nîn e.

Îro Kurdistan di bin bombe û topên Ropo de ye. Bi hezaran gund hatine şewitandin, bi milyonan mirov ji warên xwe hatine koçkirin, bi hezaran jî tên şehîdkirin. Gelê kurd birçî, bêmal, bêwar ji bo mafên xwe rih û canê xwe dide.

Qey zilma ku Ropo li bav û kalên Kamran İnan kiriye ne bes e. Kamran İnan derdikeve qanala TGRT'ya faşîst dibêje: "Dewleta tirk gerek e bibe dewleteke neteweyî û têkiliyên xwe bi dewletên Asya Navîn re bi pêş ve bibe û dîplomasiyeke neteweyî bimeşîne." Ez ji van gotinan fêm dikim ku daleqandina kalên wî, zilma ku li kurdan hatiye kirin û tê kirin ne bes e. Daxwaza wî ew e ku daleqandin, qetilkirin û zilma li ser kurdan zêdetir bidome.

Nametullah Emre/ Enqere

Welatê xwe binase

Xebatkarên Welatê Me yên hêja! Ez xebata we ya hêja û giranbuha di gel silavên germtirîn pîroz dikim. Ji destpêka weşana rojnameya Welat, pey de jî Welatê Me, heta vê gavê, ez xebatên we yên fedekarane dişopînim. Bi saya we, ez hînî xwendin û nivîsandina bi kurdî bûm. Sipas ji we re û hûn û Welatê Me her bijîn.

Birastî xebatên we têkûz û bikalîte ne. Lê dîsa jî çend daxwazên min hene. Daxwaza min a pêşî ew e ku hûn rûpelekî an jî anîşkekê bi navê "Welatê xwe binase" biweşînin. Li gorî min kurd, Kurdistanê baş nas nakin. Daxwazeke min a din jî ew e ku hûn der barê zaravayê soranî de agahiyê biweşînin. Nemaze gramer û lihevhatina wî.

Ez Newroza we, ji îro ve pîroz dikim. Her û her bimînin di xweşiyê de.

Fırat Aslan / Mêrdîn

Çiqa zilm kena biki

Hetê Dersim de, 38 kertê qebul beno. Mesele ki qesey biyê, 38'î ra raber (ver), 38'î ra têpa (pey) vanê. Dihîrê kokimî ki amey tê lêwê, 38'ra qesêy kenê. Waxtê qirkerdeni de, çutur bi Dersim. Nê xeberan ser saatan a qesey kenê.

Seyîd Riza, Elîşêr, lacê Seyîd Rizay Baba, Derê Laçî ser xêlê meseley benê. Çi ki 38, binê bandoriya dismenê kotayna; qirbayin a, merden a, vêsani ya, têsani ya, kila adir de menden a.

Mavên ra serî verdî ra. Dersimî dirbêtê xo, ebi xo deşta pîştê. Kulê dirbêta xo, ebi xo deşta melem kerdê. Wela xo di bî kêwê. Seba xelasbayîna xo û welatê xo, sere dardbi we. Wustbi ra xo ser. Dismen di bergî girot. Xo ebi çeka ra xemelna.

Dewlete, jê (sey, zey) 38 anca kote Dersim. Çi esto çîno, adir verda ci, vesna. Dewî vesnay, milet surgin kerd. Milet, welatê xo ra durî, teber de macîr mend. Çiqa vesnena bivesni, çiqa macîr verdena biverdi, ma musayimi. Qerarê qederê xo ebi deşta xo nusena.

Çiqa zilm kena biki
Na dîna to rê nêmanena
Saraya to rijina
To bine de manena.

Neviyê Seyîd/Dersim

www.arşivakurdi.org

JI WELATÊ ME

MAZHAR GÜNBAT

Cejna Newrozê a kê ye ?

Di rojên dawî de hin nivîs û nûçeyên ecêb di rojnameyên tirk de derdikevin. Ji nava wan, li gorî kurdekî bi îhtimaleke mezin ya herî ecêb nûçeya li ser Newrozê ye. Bi nêzîkbûna 21'ê Adarê nijadperest û rayedarên Tirkiyeyê dixwazin bi gelê tirk bidin bawerkirin ku Newroz ya tirkan e. Esas zêde ne zor e ji bo ku mirov zanibe Newroz a kê ye. Cewaba vê pirsê di naverok û maneya 21'ê Adarê de ye. Newroz beriya 2700 salî şeva 21'ê Adarê li serê çiyayên bilind bi pêxistina agirê azadiyê dest pê dike. Ew agir nîşana qetandina zincîrên koletiyê û serhildana li hemberî zalimtiyê ye. Kawa û Dehaq du sembolên bingehîn in ji bo Newrozê. Kawayê hesinker di vê bûyera dîrokî de di rola sereke de be jî, sebebê bûyîn û qewimîna bûyera Newrozê, Dehaqê zalim e. Ji ber wê yekê dema behsa vê cejnê bête kirin, li tenişta navê Kawa bivê nevê bi xerabî be jî wê navê Dehaq derbas bibe. Jixwe bêyî vî navê dawî ne mumkûn e Newroz rast û bêkêmasî bête şîrovekirin û nirxandin. Yek jê serhildana gelên bindest, yê din zalimtiya hukumdarên serdest ên Rojhilata Navîn di şexsên xwe de temsîl dikin. Lê gelo mirov dikare bipirse ka Newroz cejna Kawa ye an ya Dehaq e?

Bêguman tu mentiq pirseke wisa qebûl nake. Ji ber ku Newroz li hemberî zilma Dehaq rû daye. Lê eger yek karibe bibêje Newroz cejna Dehaq û hevalên wî ye, dikare bibêje ew ya dewleta tirk e jî. Yanî Newroz çiqas a Dehaq be û rola wî di Newrozê de çi be, ewqas a dewleta tirk e û rola wê jî di Newrozê de ew e. Ji aliyê şeklî ve di navbera wan de hin cihêrengî hebin jî mentiq û nêzîkahiya wan a ji bo azadiya gelan eynî ye. Eger îro general û rayedarên Komara Tirkiyeyê karibin bibêjin ku ev cejn a wan e, tê wê maneyê ku dikarin bibêjin ya Dehaq e jî. Ji ber ku tewra herduyan jî li hemberî gelên bindest şeklen ne eynî be jî, xwediyê rengekê ye. Lê em baş nizanin ka Dehaq û leşkerên wî, zimanê gelên bindest ên xwe li wan qedexe kiribûn an jî ji guh û tiliyên xortên wan ên şoreşger ji xwe re koleksiyon çêdikirin an na. Kî dizane, heye ku sicîla wan ji ya Dehaqên îro ne reştir be. Em dirêj nekin, em pirsa xwe ya li jor dikarin wiha bipirsin: Gelo Newroz ya Dehaqan e an jî ya Kawayên hemdem?

Dewleti na ray dest vist ma kirdan

Dewleti yew deme wo propaganda kena, vana "Kirdî (zazay, kurdî niyî, tirk î." Him zî, nê serranê peyenan di hina zaf vana. Hetanî nê nizdiyan vatinî "Kurdî–mirdî çinî, ma pêrû tirk î." Çiqa ki zorê ja şono, çiyanê neweyan vejena.

Labelê hewawo ki aseno, çend kirdî zî, na polîtîka dewleti miyan di yî. Nê kirdî, eke kirdê raştikên î; senêhewa nêzanî ki dewleti, ebi inhewa kena ki ma parçe bika? Senêhewa nêzanî ki dewleti, kewta tengane cora ana kena?

Ez vana ki ma kirdî, ganî hêşê xwi bancî pê ser. Hina vêşî zî no wext di. Dewleti yew hewa kewta tengane ki xwi şaş kerdo. Virî vatinî "no serehewenayişê kurdan o 29'in o, ma hezey ay bînan, heqdê nê ra zî yenî." Hewniyay ney, no serehewenayişê PKK, sey ay bînan niyo. Bindi ay bînan nêmaneno. Cengê PKK, cengdo modern û ilmî yo. Hinzaran reydi xortî, keynekî, wendoxî vejiyay koyan ser. Nînan miyan di, doktorî, miyandisî, awuqatî estî. Hûmara gerîlayan roj bi roj hina vêşî bena. Dewleti hewniyay nîşna jînî pey, va "terorîstî yewna yî, kurdî yewna yî." Labelê dîna–alem zî zana ki ferqê gerîlayanê PKK û kurdan çîno. Badî va "temam, ma realîta kurdan şinasnenî. Kurdî estî. Ma hetanî nika va'çinî' ma xeta kerda. La ganî şima kurd zî, ma ra çî nêbiwazî." Sermiyanê dewleti vanî qey ma heywan î, ma bira çî ra fahm nêkenî. Vanî qey ma ay kurdê verîn î. Nêzanî ki ay kurdê verînî merdî.

Hewniyayî nê qalanê vengan reyra çî pircuni ser nêvist, na ray dest pey kerd va "ma ismer nê terorîstan qediyênenî." A serrî şî, "terorîstî" nêqediyay. Qedênyişê yînî verda serra bînî. Serra bînî zî nêqediyay. Zoran ver heme radyo, televîzyon û rojnamey xwi seferber kerdî. Yînî zî havilî nêkerdi. Gerîlay hergû serri hina vêşî bî. Dewleti no beyntar di hinzaran reydi dewî veşnay, vengî kerdî. Gedey–gudey, extiyarî, cenî yanî ayê ki destê yînî tifing nêgêno, kutîkiştî; gurey gureyênî ardî yînî serî ser di. Hema ra zî heme guranê nêbiyayan bi şardê ma kenî. Û televîzyonanê xwi di nawnenî vanê "nêterorîst î." Yew qala ma kirdan esta, vanî "nişnî gay, şênî golikî."

Ma vêşî derg nêkî. Ma zanî ki polîtîka dewleti, heme ca di, heme çî di îflas kerdo. Hinî nêzena se bika. Na ray vanî "nê kirdî, kurdî niyî; kirdî tirk î." Hina vêşî zî 'Elewiyanê ma kirdan ra vanî "şima tirk î." Heze ki demewo ki tirkî, Asyaya Miyanin ra amey nê cayan, ma wita (îta, tiya) nêbî!

CEMAL PÎRANIJ

'Li Stenbolê teqîn'

Li gel silavên germ em serkeftina we di kar û xebatên de dixwazin. Xebata we roleke serekî heye ji bo pêşvebirina zimanê kurdî. Hûn divê bizanin ku ev zimanê ku hûn bi kar tînin, dibe bingeha zimanê van mirovên ku kurdiya wan lawaz e û dixwazin bi hêz bikin. Lewma divê zimanê rojnameya we bikare bingeheke hêmin (bi îstiqrar) pêşkêşî wan bike. Ez bawer im zimanê rojnameya we li hemû rojname û kovarên din baştir û nêzîktir e li zimanê resenê (asil) kurdî re .

Lê mixabin hindek kêmasiyên we jî hene. Ez bawer im mezintirîn kêmasiya we, wergerandina yekrast ji zimanê tirkî li kurdî ye. Ez nimûneyekê bidim; "Li Stenbolê Teqîn", ku ev li "İstanbul'da Patlama" hatiye wergerandin. Jixwe li zimanê kurdî cih herdem li dawiya hevokê (cumle) tê. Xaleke girîng ku em divê li vir li berçav bigirin ev e ku wergerandin nabê bêje bibêje be. Dibê li ser naverok û wateya (mana) hevokê bê rawestan. Tiştek din min dixwest bibêjim ev e, heger hûn bikarin vê kaxeza rojnameyê biguherînin dê pir baş bibe. Kaxezek spî bê hilbijartin dê balkêştir be.

Ez hêvîdar im dilê we neêşe li ber wan pêşniyarên min. Mixabin ez di aliyeke din de mijûlî xebatê me, lewma ez nikarim pir ji bo we binivîsim. Nexwe min dixwest zêdetir li gel Welatê Me têkiliyan deynim. Lê ez dê wê bixwînim û bidim xwendin, vê yekê ez li ser disekinim.

Her bijîn hûn, xebatkarên rojnameya Welatê Me, bi silavên şoreşgerî

Nûrî li Helsînkî Finland

FERHENGOK

Daleqandin: Bidarvekirin
Dever: Herêm
Devok: Şêwe (şive)
Erênî: Pozîtîf, mûsbet
Elimîn: Hînbûn, fêrbûn
Elimandin: Hînkirin, fêrkirin
Kevneşop: Edet, tore
Kone: Xapînok, fênek
Kulm: Gurmist
Lêker: Fiîl
Naverok: Conteks (içerik)
Nemaze: Bitaybetî, exleb
Neyînî: Negatîf,menfî
Paşpirtik: Paşgir, sufiks
Pêşpirtik: Pêşgir, prefiks
Pêvajo: Doman, proses
Qewirandin: Qewitandin
Ronakbîr: Rewşenbîr, munewer
Seyandin: Siwaxkirin
Têkûz: Mukemel
Vatinî: Peywir, wezîfe
Zar: Ziman
Zarava: Lehçe
Zayend: Cinsiyet

AGAHIYÊN ABONETIYÊ

Min Welatê Me Divê

	Li Hundir	Li Derve
☐ 3 Meh	☐ 400.000 TL	☐ 35 DM
☐ 6 Meh	☐ 800.000 TL	☐ 70 DM
☐ 12 Meh	☐ 1.600.000 TL	☐ 140 DM

Bedelê Abonetiyê ez radizînim

Li Tirkiyê – Roza Basın ve Yayın. San.Tic.Ltd.Şti.
Yapı–Kredi Parmakkapı Şubesi
Hesap No: 1100264–1

Li Derve – Roza Basın ve Yayın. San.Tic.Ltd.Şti.
Yapı–Kredi Parmakkapı Şubesi
Döviz Tevdiat Hesap No: 3001507–3

NAV Û PAŞNAV : .....
NAVNÎŞAN : .....
.....

Navnîşana Welatê Me
Ayhan Işık Sok. No:23/3 Beyoğlu/ İST.
Tel–Fax: 2491344 – 245 29 91

WELATÊ ME

Rojnameya Hefteyî
(Haftalık Gazete)

Li ser navê
ROZA Basın ve Yayıncılık San. Tic. Ltd. Şti. adına
Xwedî (Sahibi)
Aynur BOZKURT

Gerînendeyê Weşanê
(Yayın Yönetmeni)
Mazhar GÜNBAT

Berpirsiyarê Karê Nivîsaran
(Yazıişleri Müdürü)
Metin AKSOY

Berpirsiyarê Nûçeyan
(Haber Sorumlusu)
Suut KILIÇ

Redaktor
Sami TAN

NAVNÎŞAN (Adres)
Ayhan Işık Sok. No:23/3
Beyoğlu / İSTANBUL

TEL–FAX
249 13 44 – 245 29 91

ÇAPXANE
Yeni Asya Matbaacılık A.Ş.

NÛNERÎ
(Temsilcilikler)

Suriye– Jan Dost
Fener Rojbiyanî
Berlin– Silêman Sido
49-30-69 00 26 95
Bonn– Ahmet Baraçkılıç
49-228-66 62 49
Hannover– Selîm Biçûk
49-5721-813 60
Hamburg– A.Hekim Gülsün
49-40-40 33 88
Munchen– Mahmut Gergerli
49-871-670 884
Badenwurttenberg–
A. Rahîm Ayaz
49-75453258
Swed– Amed Tigris
46-8-740 69 81
Amsterdam– Cotyar Zaxoy
31-20-613 07 66
Parîs– M.S. Ayçiçek
33-1-48000401
Atina– Sîrwan Reşîd
Bekir Bahoz
30-1-3634905

LE HEWTEMÎN SALROJÎ TEVKUJÎ ŞARÎ ŞAÎRAN DA...

HELEBCE: Birînêkî qûl û zamêkî beswê

LAWIKÎ HELEBCE

Be tenya cêy mehêlin
Tem û mij daydepoşê

Gerûy be gizing ter ken
Be goranî daypoşin

Serî be şepolan ken
Balay le hewir bigrin

Be tenya cêy mehêlin
Şar berde baran deka û

Sware çi şore swarê
Be goranî û tîşk û maç

Ba kejawey le gûl bê
Zemawendî xwên degrê

Aşiqêkî lasar e
Be tenya cêy mehêlin

Em şew ziryan deyçênê
Mange şew deyrifênê

Zamakanî be şîlan
Yan be sewzî daristan

Ba em şewe rajênê
Birûske û ba deçênê

Mindalêkî lasar e
Mang dekat be kolare

Espî hetaw zîn dekat
Ser zemîn berîn dekat

Yan le pelke zêrîne
Em şew paşay ewîn e

Birûske û ba deçênê
Mange şew deyrifênê.

REFÎQ SABÎR

Adar bo ême ew mange şûm û negrîse ye ke zorbey xewne geşekanmanî tiya da cwanemerig kirawe. Adar bo ême amêzêkî xamoşe û hemîşe qurbanyekanmanî tiya da debînîn. Ew careşyan her le Adar da Helebce hate rîzî mergesatekanî dîrokî nwêmanewe.

Le yad û salrojî Helebce da mirov nazanêt tif le nawçewanî kê bikat. Be rastîş mirov doşdademênê û nazanêt kê şeytan asa berde baran bikat. Tawanbaran zorin, yek, duwan, de û sed nîn, be tenya Sedamî mirovkuj tawanbar niye, nexêr... Le pişt abakey Sedam ewe zor kesî tirîş tawanbarin, pir kesên tirîş yarîdeder û zemîne xoşkerin bo ewey Sedam be keyfî xoy Helebce bikate taqîge û piyawanîşî teratên û bazbazênî tiya biken. Împiryalîzmî cîhanî ke çaw le karêkî wa denuqênin, lew kesanen ke le piştî karekewen, ewan be zanayyewe ew kare encam deden, dexwazin be berdêk dû çoleke bikûjin, belê gerekiyane qazancekeyan dû loyî bêt, dena ewan be hoy amêr û teknîkî hawçerixyanewe le Helebceyekan baştir dezanin le Helebce da çî rû dedat û kê ew şare kawil û xane wêran dekat, belam daway belge û selmandin le gelî kurd deken bo ewey bizanin kê way le Helebce kirduwe.

Ah ke birînêkî qûl û zamêkî beswêy Helebce

Çon le karesateke da mirovî kurd sergerdan debêt, awaş le perawêzî Helebce da kesanêk nanyan dekewête ronewe û biskey simêlyan dêt.

Diyar e ke beranber be Helebce layene siyasyekanî kurdîş tawanbarin û tawanekeyan

ewende kem yan heleyekî sitratîjî niye ke pakaneyan bo bikrêt. Ew layenane xoyan û piyawekanyan be destî enqest û be hoşyariyewe hemû carê ew kilawe dekenewe ser gelî kurd, dena xo dway Helebce deyantwanî kemêk le karesatî Enfal eger kemêkîş bwaye gelekeyan biparêzin. Yan hîç na agadarî bikenewe, rê û cêyekî bo desnîşan biken û pêy bilên: Em kabraye cêy mitmane niye û hemû şitêkî xirapî le dest dêt, beranber bewe êmeş ew hêzeman niye êwe biparêzîn, kewate çarî xotan biken. Nexêr ew ke eme nakat, rêgeşî lê degrê û naçarî dekat ke çarenûsî be eqlî ewewe girê bidat, paşan her ew xoşî "kadirî parte siyasiyeke" ber le kabray gûndî dêtewe baweşî germî dewlet, emcareş û lem sergereşewe bo mirove kurde renc be xesareke debête asteng û kelem. Le Helebce, Enfal û karesatekanî tirî Kurdistan da, emeye rolî mêjûyî parte siyasiyekan û be naw şorişgêrekanî kurd, ke qetawqetîş dan bem tawaneyan da nanên û pakane bo xoyan û desie û taqimekeyan deken.

Êstaş le yadî salrojî Helebce da, le birî ewey kemêk le barî sextî ew xelkey Helebce kem bikenewe, parte siyasiyekanî başur Helebce yan kirdote meydanî teratên û rimbazênî xoyan, her rojey yekêkiyan deygirin û ewî tiryan şar beder deken. A eme ye tawanî ewan beranber be Helebce û hemû kurd, ke le amêzî xembar û xamoşî w şare şehîde da kurd be kurd be kuşt deden û zamî qûlî dwênêy Helebce le bîr deken, le birî ewey Helebce bilawêninewe û des be kakolî alozî da bihênin, dîsanewe cergî dax deken û be ber çawyewe rolekanî dekene dûjminî bawe kuştey yek tir û pakaneş bo ew karey xoyan deken û deyxene rîzî kare "şorişgêryekanî" tiryan.

Le yadî hewtemîn salrojî mergesat û tevkujî Helebce da, rohî Goran, Bêkes, Tayer Beg, Ehmed Muxtar û hwd. pêman delên: Be tenya Baasyan berde baran meken, be tenya Baasyan beranber be ême tawanbar nîn, Baasyan şagirdî zoryan hen ke haw ziman û haw xwênî xomanin û roley helalzadey napake gewrekanî mêjûmanin... Ewanîş riswa û şarbeder biken, mehêlin her be kolî em gelewe bimêninewe.

SÎRWAN REHÎM

elinewerek

www.arsivkurd.org